


**Ç**îrok û roman ji regekî din in, di van celebên toreyî de, torevan li pêşiya afirandina rojeva nû ye, ji ber ku her torevan gerek 'fabrîkeyek' di hinavên wî de peyda bibe. Wan bûyeran tê re derbas bike ta ku ew bûyer tê de bikelin, heta bistewin, li gorî nêrîna wî û hostahiya wî û pêlewaniya wî karekî toreyî bedew bide.

R. 8-9



**Nûçe:**

Li Erziromê provokasyon bi ser neket

R. 3

**Lêkolîn-Sami Berbang:**

"Le ser êwe pêwîst e ke toley min bistênînewe"

R. 45


**Zülküf Kışanak:**

Gula Serhed, Embaza Serpil Yılmaz

R. 6



## WELAT



SAMI TAN

Gelê tirk heta nasnameya gelê kurd bi awayekî zanistî nas neke, çand û nirxên neteweya kurd bi şeweyekî zanistî nas neke, nikare xwe jî nas bike û xwe jî êrîşên împeryalîstîtan biparêze.

## Tevgera milyonan nabe marjînal

Dewleta tirk li Kurdistanê stratejiyêke nû dimeşîne. Ew politîka wekî marjînkirina tevgera kurd tê daxuyandin. Bi sedhezaran hêzên çekdar ên dewletê xistine bakur û başûr Kurdistanê, lê çalakîyên gerîla tevî mercên giran ên zivistanê jî ranewestîne. Li aliyê din herêma Behra Reş û Behra Spî jî êdî bûne qadên şer.

Dewleta tirk li qada navneteweyî êdî hew dikare berevaniya xwe bike, ji ber vê yekê her roj dev diavêje dewletekê. Lê dîsa jî nikare rê li ber rewabûna tevgera kurd di qada navneteweyî de bigire, pêşî bi bûyera penaberan li Îtalyayê, piştî re jî bi biryara Serdozgerê almanî li Almanayê rewabûna tevgera kurd hate peyitandin.

Di destê dewletê de bi tenê çeka şovenîzmê û zilm maye. Niha bi taybetî berê xwe daye saziyên neteweyî, yek bi yek kîlîtê li deriyê wan dide. Bi vî awayî dixwazê sûcê xwe bincil bike.

Hefteya çûyî bi biryareke nerewa, kîlît li deriyê NÇM'ya Amedê xist, bi hinceta ku ji çalakîyên xwe de destûrê nastînin, lê tê zanîn ku tu mecbûriyeteke bi vî rengîtone, ji tu navendên çandî jî berî ku çalakîyan li dar bixin destûrê nastînin. Baş xuya ye ku ev êrîş bi mebesta "marjînkirin" a tevgera azadîxwaz e. Pêşî li Kurdistanê didin destpêkirin, hêdî hêdî ber bi navendê ve tên. Heke mirov bê deng bimîne, wê di demeke nêzik de îcar êrîşî navenda saziyên neteweyî bikin.

Gelê kurd li hemberî van êrîşan serî natewîne, ev yek jî di domana greva birçîbûnê de xwe da der. Peywira hemû kesên azadîxwaz e, ku li hemberî vî stratejiyê, stratejiya geşkirina tevgera azadîxwaz bimeşînin û mêtîdarên ku li ser rûyê erdê çeperî li wan teng bûye, marjînal bikin.

Ji bo vê yekê, pêdivî ye ku saziyên neteweyî pêşî yekîtiya xwe xurt bikin, piştî re jî bi tevgera demokratîk a gelê

tirk re hevalbendiya xwe zeximtir bikin.

Her wekî serokatiya tevgera azadiyê jî dide zanîn, di sala 1998'an de digel yekîtiya neteweyî wê çeka şovenîzmê jî bêtesîr bimîne.

Diyar e ku mafên demokratîk ên gelê kurd ne li dijî berjewendiyên gelê tirk in. Gelê tirk dema gelê kurd baş binase, wê xwe jî baş binase. Heta ku ew nasnameya gelê kurd bi awayekî zanistî nas neke, çand û nirxên neteweya kurd bi şeweyekî zanistî nenirxîne, nikare xwe jî nas bike û xwe jî êrîşên împeryalîstîtan biparêze. Bo nimûne, zimanê tirkî li ber zimanên împeryalîstîtan tê pişaftin. Lê bîrdoza faşîst çavên xwe ji vê yekê re digire.

Dema gel destê xwe bidin hev û dest bibin xwe, ev stratejî wê çem û çem di avê de biçê. Lewre komek mijokdar nikare tevgera milyonan marjînal bike.

## Wexta vegeerîna li zimanê neteweyî hatiye

## Ferhengok

M. EMİN ALTOX

<b>avjenî:</b> soberî, melevani	<b>malika masê:</b> berkêş (çekmeçe)
<b>belam:</b> lê, lê-belê, ama	<b>mêjû:</b> dîrok, tarîx
<b>berevanî:</b> parastin, berhîngarî	<b>nîfş:</b> say, kuşak
<b>beybûn:</b> papatya	<b>nîşe:</b> têbînî, not
<b>celeb:</b> cure, çeşît	<b>panav:</b> mesafe
<b>çakî baş, çê, qenc</b>	<b>pêjînkar:</b> hestgem, hasas
<b>çêlikirin:</b> behskirin	<b>pêngav:</b> gav
<b>demjiyan:</b> serdem	<b>pêşverû:</b> terakîperwer (ilerici)
<b>dengkirin:</b> axivin,	<b>pişkkirin:</b> parvekirin, dabeşkirin
<b>dojeh:</b> cehenem	<b>pit:</b> dergûş, landik
<b>embaz:</b> heval	<b>reng e:</b> dibe ku.
<b>ezmûn:</b> tecrûbe, imtihan	<b>rêl:</b> daristan
<b>êl:</b> hoz, êşir	<b>rondik:</b> hêstir, firmêsk
<b>êsta:</b> niha, nika	<b>serkirdayê:</b> rêveberî, desthilatdarî
<b>geşedan:</b> pêşketin, kemilîn	<b>sîrûd:</b> marş
<b>gerdûnî:</b> kafiya, çihani	<b>sîzêf:</b> çet, dijûn, xewer
<b>gemas:</b> leheng	<b>stewîn:</b> kemilîn, perîin
<b>gireger:</b> kesên bijarte,	<b>şîrav:</b> özsu
<b>helsangandin:</b> nirxandin	<b>taybetmendî:</b> gewşin, xususiyet
<b>heyber:</b> mahlûqat	<b>temen:</b> emr, jî
<b>jiyanewe:</b> vejîn	<b>tevkari:</b> hevkarî
<b>kamend:</b> fermanber, memûr	<b>tewş:</b> tiştên ne di cih de
<b>karwanî:</b> pratîk	<b>tinazî:</b> ironîk, qerfokî
<b>katjimêr:</b> demjimêr, saet	<b>torevan:</b> wêjevan, edebiyatvan
<b>kelk:</b> havil, sût, fêde	<b>tundraw:</b> radîkal
<b>komcivîn:</b> kongre	<b>ûşûbûn:</b> rашtatin, pêgîhatin
<b>komelayetî:</b> çivakî, sosyal	<b>xame:</b> pênûsa hibîf
<b>konevanî:</b> ramyarî, siyasî	<b>xar:</b> bilye
<b>kurkirin:</b> traşkirin	
<b>lêzim:</b> eqrebe, xizim	

Ziman, haceteke ku ji taybetmendîya mirovanê, haceta ku mirov hîs û fikrên xwe pê dibêje. Ziman, dîroka mirovahiyê ye. Ji bo ku carê mirov werin cem hev, pêwîstiyêke esasî ya rêxistinê ye. Bi wê sedemê li ser hişê mirovan tesîra wî pir heye.

Ji dîroka tê fêmkirin ku, gelên ku berî Medan li Kurdistanê jiyane, li şûna xwe gelek berhemên wêjeyî "ên bi devkî û nivîskî" hiştine. Hîna jî wê demê ve mînakên wekî hozanê Kassîyan Sîn-Lekke-Ünnîni hene. Dîroka jî dewra Medan û piştî wan jî berhemên wêjeya kurdan ên bi devkî û nivîskî destnîşan kirine.

Bi hezaran sal piştî Îsa, dîsa wêjevan li Kurdistanê pir in. Mînak Memê Alan û gelek destanên wêjeyî ku di pêşketina gelê kurd a civakî de nişana gavên mezin in. Dîsa Ehmedê Xanî, di destana xwe ya bi navê Mem û Zîn de, ku ew di dema xwe de mîna şoreşekê bû, civaka kurd, perçebûna civakê, tunebûna serokatiyê, yekîtiya neteweyî û hesreta azadiyê diyar dike.

Lê belê heya îro, berhemên ku kifş bûne hemû jî aliyê dagirkeran ve hatine talankirin, an texrîb bûne, an jî xesp bûne û zimanê kurdî qedexe bûye. Bi wê sedemê kurd di warê wêjeyê de jî li paş mane.

Ji bo pêşketina ziman ku ji bin bandora biyanan derkeve, li ser xurtbûna xwe divê jî nû ve di nav gel de zindî bibe, xebateke şoreşgerî pêwîst e û

pêdiviyêke neteweyî ye.

Mirovê ku bi xebateke şoreşgerî li zimanê xwe xwedî derkeve, wê bikaribe wêjeya xwe jî rind û geş bike.

Gelên ku neteweya wan bi hêz û qewet e, zimanê wan zindî ye. Zimanê zindî jî wêjeyeke bi nirx û qîmet diafirîne. Wisa xuya ye ku zimanê kurdî jî, wekî neteweya kurdan li ber xwe dide. Lewre; Kurdistan ji aliyê dagirkeran ve tê talankirin û hatiye pişkkirin. Her dewleteke dagirker taybetmendîyeke cuda li ser civaka kurdan ava kiriye.

**Wekî ku pêşiyên kurdan dibêjin "Siwarê hespê xelkê, tim peya ye." Şoreşê pêşiya hemû lêkolînan vekirîye. Maye ku kes û saziyên pêşverû, bi awayekî şoreşgerî û bi kurdî wêjeya xwe çêbikin.**

Kurd bûne xwediyê dezgehên civakî, konevanî, aborî ên biyanî; di bin çanda ereb, tirk û eceman de asimilê bûne.

Lê îro wekî hemû welatên ku şoreşa xwe ava kirine û di avakirîna de berî şoreşê çand, huner û wêjeyê pir rolên mezin listine. Mînak; di dema şoreşa birjuwa de ronensansê û di dema Şoreşa Oktobêrê de jî wêjeya rûsî, ji bo pêşketina şoreşê rolên mezin listine. Îro Têkoşîna Rizgariya Neteweya Kurdistanê, derfetên wisa girîng ji wêjeya kurdî re amade kirine. Tê xuyakirin ku gelê kurd bi xurtbûna Tevgera

Azadiyê re ji nû ve bi helecana bûye, bi azadiya xwe ve hatiye girêdan, dixwaze xwe, bi berhemên wêjeyî yên bi devkî û nivîskî jî bîne zimên.

Lê, îro hinek hêzên reformîst, ên ku bi salan karê neteweyî û tevgera konevanî daxistine kêşeya zimên, ka û dan, zad û zîwan tevî hev kirine. Diyar e ku di warê wêjeyê de jî nêzîkbûneke şoreşgerî gelek pêwîst e.

Êdî îro kurd hatine wê merheleyê ku ew zimanê xwe bi kar binin. Wekî ku kurdan, zimanê tirk, ereb û eceman, bi deyn dixebitandin, dixwaze wî emanetê wan bidine wan û li zimanê xwe xwedî derkevin. Wekî ku pêşiyên kurdan dibêjin "Siwarê hespê xelkê, her dem peya ye." Êdî wext, wext e ku kurd, li zimanê xwe, li qeweta xwe, li çand û hûnera xwe vegeerin. Îro ev rastiyeke pir germ e û Tevgera Azadiyê ev derfeta girîng daye kurdan. Şoreşê pêşiya hemû lêgerîn û lêkolînan vekirîye. Ji bo pêşketina wêjeyeke hemdemî tu asteng nemane. Maye, ronakbîr û rêxistinên pêşverû, dest û bendên xwe hildin, bi lez û bez, bi terzeke şoreşgerî û bi zimanê kurdî wêjeya xwe çêbikin. Lewre wêjeya kurdî bi zimanê biyan çênabe.

Pêwîst e ku saziyên kurdan hemû li ser ziman pir rawestînin û bîngeha zimanê kurdî fireh bikin. Wêje bi ziman re fireh dibe, kûr dibe û di rêxistînbûna gel de roleke mezin û girîng bi cih tîne.



# Li Erziromê provokasyon bi ser neket

Ji ber polîtîkayên dewletê her dem girtî rûberî pirs-girêkên pir dijwar dimînin. Mafên însanî yên girtiyan nayên nasîn. Ev yek ji 20 salan û bi vir de didome. Di pêşî de bi giştînameya Mehmet Topçu, dûre ya Mehmet Açar û Şevket Kazan, niha jî bi ya Oltan Sungurlu, dixwazin jîyanê li girtiyan bikin dogeh, lê berxwedan rê nade vê yekê.

Dewleta tirk, polîtîkayên ku berê ji ber berxwedana girtiyan nikaribûn pêk bîne, îro li girtîgehên, bi taybetî jî di girtîgehên li Kurdistanê de dicêribîne. Di vî warî de dewletê girtîgeha Erziromê ji xwe re kiriye ezmûngeh (laboratûwar). Girtiyan Zîndana Erziromê 55 rojan di greva birçîbûnê de man. Li hemberî vê yekê çapemeniyê û raya giştî bédengiya xwe domand.

Dewletê biryarên siyasî digirtin û digot daxwazên girtiyan siyasî ne, eger em daxwazên wan bipejirînin, emê ji polîtîkayên xwe tawîzê bidin. Ev yek jî li hisabê dewletê nedihat. Oltan Sungurlu yê ku goristana Eskişehirê xiste faalîyetê, îro dîsa li ser kar e. Karê xwe yê nivco mayî dixwaze temam bike û dibêje: "Girtiyan bi fermana rêxistinên nehênî dest bi greva birçîbûnê kirine." Piştî wî, serokwezîr vê bûyerê bi awayekî siyasî hildisengîne. Li ser van daxuyaniyan malbatên girtiyan di serî de rêxistinên civakî yên sivil ku bi vê yekê diêşe, protêsto û çalakî li dar xistin. Malbatên girtiyan di navçeyên HADEP'ê de greva birçîbûnê dane destpêkirin. Partiyên ANAP, DSP û DTP hatin dagirkirin. Ev helwesta dewletê ya siyasî jî aliyê raya giştî ve wekî sersariyekê hate binavkirin. Li gorî nixandinan, dewlet dixwaz-

ze ku girtiyan hem ji aliyê fizîkî ve, hem jî ji aliyê ruhî ve têk bibe.

Tê zanîn ku piştî birçîbûna 55 rojan ji aliyê tenduristî ve xesareke mezin digihêje girtiyan. Li ser berxwedana dawî û rewşa girtîgehan me dîtî û ramanê siyasetmedar, sendîkavan û hiqûqzanan girtin. Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak, Serokê Giştî yê KESK'ê Siyami Erdem û Serokê Giştî yê Tûm Yargı-Sen ê Tekin pirsên me bersivandin.

## Daxuyaniyên hikûmetê ji cidiyetê dûr in


Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak jî ji bo ku pirs-girêkên girtiyan çareser bikin çûbû Erziromê. Bozlak bi dozger, walî û rêveberiya girtîgehê re hevdiîtin pêk anîbûn. Roja çarşemê di navbera îdare û girtiyan girtîgeha tîpa taybet de peymanek bi navbertiya heyeta ku Bozlak jî di nav de bû, pêk hat. Li ser vê yekê Bozlak di heman rojê da biryara siyasî ya dewletê ji me re nixand. Bozlak diyar dike ku, daxuyaniyên dewletê pirs-girêkên li girtîgehan aloztir kirine. Serokê Giştî yê HADEP'ê bi awayekî tûj van kirinan rexne dike.

Ji aliyê din ve Bozlak dibêje: "Pirs-girêk jî îdareya girtîgehê diqewimin, midûr diguherin an jî gardiyanên ku diguherin pirs-girêkan derdixin. Her wiha bi giştî peywirdar ji MHP ne, hin gardiyan hene ku bi awayekî bîrdozî nêzîkî meseleyê dibin." Bozlak diyar dike ku biryarên dewletê ji binî ve siyasî ne, lê daxwazên girtiyan mirovî ne.

## Ev daxwazên girtiyan însanî ne

Serokê Tûm Yargı-Senê Tekin Yıldız li ser biryara hikûmeta MGK'ya dawî û li ser rewşa girtiyan ya giştî û demokratîkbûna hikûmeta Yılmaz daxuyaniyên balkêş dan rojnameya me. Li ser béeleqebûnê jî, berî dewletê raya giştî rexne kir. Yıldız got: "Di roja roj de me sersarî kir. Hetanî vê gavê kesî ev bûyera giştî nexiste rojeva xwe. Niha ev mirov gihîştin asta mirinê, êdî em li hev dikevin û dibêjin ka emê çî bikin."

Tekin Yıldız li ser polîtîka dewletê vê nixandîne dike: "Polîtîkaya dewlete ya îmhayê ye. Vê yekê jî bi riya hucre tîpî û êrişên li ser girtiyan pêk tîne." Li gorî Se-



Murat Bozlak

rokê Tûm Yargı-Senê, êrişên dewletê yên li ser kedkar û mirovan jî pêşî di girtîgehan de dest pê dikin.

Yıldız, diyar dike ku, divê em ji dewletê tişteki hêvî nekin, li derve rêxistinên demokratîk bi çalakiyên xwe rê li ber êrişên dewletê bigirin.

## Dewlet mecbûre ewletiya canê girtiyan misoger bike

Serokê KESK'ê Siyami Erdem jî dadixuyîne ku, dewlet divê di nav rewşeke wisa de be ku karibe daxwazên girtiyan bipejirîne. Erdem diyar dike ku, tu kes jî ber xwe nakeve greva birçîbûnê (rojîya mirinê), diyar e ku pest û kotekiyên mezin li ser girtiyan hene.

Li aliyê din Serokê KESK'ê Erdem, li ser biryara siyasî ya dawî ku ji aliyê hikûmetê ve hate girtin, ev nixandîna kir: "Daxwazên girtiyan ne siyasî ne, daxwazên wan jî bo başkirina rewşa xerab in."

Wî da zanîn ku ew bi çavekî siyasî li girtiyan nanihêrin û tu cudatiyê naxin navbera ziman, ol, nijad û cinsan û ew dixwaze ku daxwazên girtiyan wekî daxwazên siyasî neyên nixandînin.

Erdem di berdeewama axaftina xwe de bal kişand ser kadroyên dewletê yên ku di girtîgehan de hatine bicihkirin û diyar kir ku divê ew kadro ne aligir bin. Divê bi awayekî pêşdarazî nêzîkî girtiyan nebin.

Herwiha Serokê KESK'ê Siyami Erdem, diyar dike ku nêzîktêdayina dewletê, jî fêhmîkirin û ji çareserkerina pirs-girêkan gelekî dûr e. Li gorî wî, dewlet nikare bibêje, bila girtî bimirin, dewlet û hikûmet berpirsiyarê parastina ewletiya canê girtiyan e. Siyami Erdem di dawîya axaftina xwe de, got ku gel ji wan kirinên dewletê zivêr dibe û dixwaze ku li girtîgehan mercên însanî jî bo girtiyan pêk werin.

AZAD ALTUN

## Kurtenûçe

Penaberên kurd ketin rojeva parlamentoya Ewropayê. Nûnerên partiyên siyasî yên Parlamentoya Ewropayê bal kişandin ser rewşa penaberên kurd û ji dewletên Yekîtiya Ewropayê xwestin ku ew li dijî Tirkîyeyê ambargoya çekan pêk bînin. Seroka Koma Sosyalîstan Pauline Green der heqê koçkirinê de got ku ew bi Îtalyayê re ne. Her wiha Seroka Koma Keskan Claudia Roth, aloziya penaberan wekî pirs-girêkeke siyasî bi nav kir û xwest ku li hemberî dewleta tirk hinek tedbîr bînin girtin.

Polîsan li Kadikoya Stenbolê êriş bir ser xwendekarên Zanîngehan ku dixwestin ji bo protestokirina kuştina Ümit Cihan Tarho meşekê li dar bixin. Di encama êrişê polîsan de 25 xwendekar tevî nûçegihanê rojnameya Atılımê bi kişîşandin, cop û qalasan xistin binçav. Her wiha polîsan di xwepêşandanê de êriş birin ser rojnamevanan û ji bo ku wêneyan nekişînin ew tehdît kirin. Hate ragihandin ku xwendekarên ku xwestine bimeşin girêdahiyê Federasyona Komeleyên Xwendekarên Tirkîyeyê (TÖDEF) bûne.

Sendîqeya Rojnamevanên Nêsteweyî ya Brîtanayê (NUJ) bal kişand ser rewşa tenduristî ya rojnamevanê kurd Hasan Özgün û 25 hezar endamên xwe der barê vê yekê de agahdar kirin. Sendîkaya ku li welatên Îngîlistan, Îskoçya, Galler û Îrlandaya Bakur 25 hezar endamên wê hene, di weşana xwe ya bi navê 'Journalist' de rewşa Özgün hilda dest. Di kovara Journalist de hatiye nivîsin ku Özgün, jî bo ku rojnamevan bûye hatiye girtin û bi darizandineke nehiqûqî ew hatiye mehkûmkirin.

Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) şaxa Amedê ji hêla Beşa Komeleyan a Midûriyeta Emniyeta Amedê ve roja 14'ê rêbendanê bi biryara Wilayetê hate girtin. Di biryara Wilayetê de girtina NÇM'ê bi hincetên ji bo çalakiyan bêdestûrî û bêruxsatî tê girêdan. Der heqê girtinê de Parêzerê NÇM'ê Sinan Tanrikulu biryarê bêbingeh û jî rastiyê dûr nixand û got ku ew, dê ji bo betalkirina biryarê itiraz bikin. Her wiha NÇM'a Amedê daxuyaniyek da û biryar wekî bêtehmûliya li hember çanda kurdî şîrove kir.



Siyami Erdem



# Serokomarê Komara Kurdistanê Qazî Mihemed: “Le ser êwe pêwîst e ke toley min bistênînewe”

Tiştên ku bûne sedema têkçûna komarê jî; tengbûna herêma ku lê ava bûye, nexweşiyên civaka kurd in. Dubendî û nakokiyên êşîrî nahêlin ku rêxistin û sazîyên neteweyî yên xurt pêk werin. Kêmasiya herî mezin a serokatiya avakarên komarê, zelalnebûna dîtin û ramanên wan ên li ser doza neteweyî û baweriya wan a bêbingeh bi hêzên derveyî ye.

SAMI BERBANG

20<sup>ê</sup> gelawêja 1941'ê hêzên Sovyet, Îngilistan û Amerîkayê ketin Îranê. Diktatoriya Rîza Şah cihê xwe ji hikûmetê qels re hişt. Ev hikûmet li Tehranê niştêcih bû, lê bandora wê li ser başûrê dewleta Îranê nîn bû, lewre ew herêm di bin destê hêzên îngilîz û amerîkiyan de bû. Her wiha li ser bakur jî bandora hikûmetê nîn bû, ew der jî ji aliyê hêzên Sovyetê ve hatibû wergirtin.

Mehabad ji aliyê tu kesî ve nehatibû dagirkirin. Li wê deverê her tim hestên neteweyî yên kurdan di nav gel de xurt bûn. Nebûna otorîteya dewletê dagirker, rê li ber geşedana rêxistinên azadîxwaz vekir. Bi pêşketina civaka kurd ji aliyê aborî û çand ve jî rê li ber geşedana bajarvaniyê vebû. Êl û hozên kurdan ên koçer yek bi yek li bajaran bi cih dibûn, ji nav civakê komek mirovên xwende û karmend derdiketin. Serokên êşîrên kurd jî hêdî hêdî digihîştin vê baweriyê ku bi yekîtiyê hêsantir dikarin berjewendiyên xwe biparêzin. Li aliyê din hêzên derveyî jî bi nûnerên kurdan re hinek civîn û kombûn pêk dianîn, dixwestin bandora xwe li ser wan bihêlin. Bo nimûne di rezbera 1941'ê bi berpirsên hêzên îngilîz re hevdiînek çêbû, di meha sermawezê de Sovyetistanê 30 heb giregîrên civaka kurd vexwendin paytexta Azerbeycanê Bakûyê; di nav wan kesan de Qazî Mihemed jî hebû. Di gulana 1942'yan de gera duyemîn pêk hat. Nûnerên kurdan di sa çûn Bakûyê. Di van serdanan de têkiliyên germ di navbera nûnerên kurdan û nûnerên Sovyetistanê de çêbûn.

Di rezbera 1942'yan de 15 xort li Mehabadê di malekê de komcivînek pêk anîn û Komeley Jiyanevey Kurdistan (JK) hate avakirin. Abdurrahman Zebîni bû sekretêrê vê rêxistinê. Nûnerê rêxistina başûrê Kurdistanê Hîwa, Mîr Hecî ji di nava vê civînê de cihê xwe girtibû. Mîr Hecî di artêşa Iraqê de subay bû.

Di nava şeş mehan de sed endamên komeleya JK'yê çêbûn. Mîltanên rêxistinê li başûr heta Senendajê, li bakur jî heta ser sînorê Sovyetistanê belav bûn, xebata xwe gur kirin. Di sala 1944'an de bi nûnerên tevgera azadîxwaz a bakurê Kurdistanê re têkiliyê hate danîn. Di gelawêja 1944'an de nûnerên tevgera kurd ji sê parçeyên welêt (Bakur, Başûr, Rojhilat) li ser sêgoşeyê ku



Serokê Komara Kurdistanê Qazî Mihemed, digel hinek rêveberên komarê û du helbestvanên navdar Hêmin (aliyê çepê yê Qazî) û Hejar (aliyê rastê yê Qazî)

sînorê her sê dewletên dagirker digihêje hev, li ser çiyayê Dalanpûr civînek pêk anîn û biryara hevkarî û hevalbendiyê girtin.

Divê bê gotin ku weşanên kurdan ên li Başûrê Biçûk û Bêrûdê derdiketin, di nav rûpelên xwe de cih dane agahiyên li ser vê rêxistinê. Lê mirov tê derdixê ku têkiliyên rawestên ku van weşanan derdixin rasterast bi berpirsên rêxistinê re nîn in. Lewre agahiyên ku li ser wan tên dayîn ji rojnemeyên farişî hatine wergirtin. Di sa mirov tê derdixê ku haya wan jî çalakiyên rêxistinê û weşanên ku ew derdixê heye. Bo nimûne di nav rûpelên Roja Nû de mirov rastî hinek agahiyan tê. Di nav rûpelên vê kovarê de navê komeleya navborî wekî "Komeleya Komunistên Kurd" cih girtiye. (Roja Nû, hêjmar 64, 17'ê berfanbara 1945'an)

Di hêjmara 69'an a heman kovarê de (25 reşmî 1946) "Armanca Komeleya Komunistên Kurdistanê" hatiye nivîsandin.

Komeleya JK ku bi rêxistina hucreyî karê xwe bi rê ve dibir, piştî demekê di nava ciwanên kurd de nav û dengê wê belav

bû. Her wiha di tîrmeha 1943'yan de hejmarê yekemîn a weşana Komeleya Jiyanevey Kurdistan a bi navê "Nîştîman" li Tewrîzê derket.

Di vê hejmarê de rexneyên tûj li axa û begên kurd tên girtin:

"Hûn, axa û begên êşîrên kurdan, we qet ji xwe pirsîye ka ji bo çî dijmin ew qas pere dide we? Ew dide we ji ber ku dizane, ew pere wê dibe hacetekê da ku pê rizgariya kurdan li paş bê xistin. Her wiha dijmin hêvî dike ku ew pere bibe çek û zirarê bide kurdan." Tevî ku di nav rûpelên kovarê de hinek rexneyên tûj li şêx û melayan dihatin girtin jî, helwesta rêxistinê li hemberî wan nermtir bû. Bo nimûne melayê Koysancaqê Mela Mihemed di hejmareke kovarê de bi zimanekî tûj êrişî mela û şêxan dike, lê li nik wê nivîsê, ew nixandina berpirsên kovarê heye:

"Çewtîyeke mezin e ku mirov bibêje (hemû) şêx û mele rê li ber pêşketina kurdan digirin... Şêx û meleyên ku ji hêla Mele Mihemedê Koyê ve tên rexnekirin ew ên ku doza remildarî û xwedan-kerametiye

dikin, ew in. Ew kes digel axayan berpirsê lipaşmayîna kurdan in û dibin sedema êş û jana ku em dikişînin."

Di destpêka sala 1945'an de piraniya axayan ku li derdora Mehabadê niştêcih bûn, ketin nava refên Komeleyê, tevî ku ev rêxistin xwediyê literatûreke çinayefî bû jî. Lewre êdî ew bûbû sembola doza serxwebûna ji otorîteya navendî. Divê bê gotin ku Qazî Mihemed ji zû de ev rêxistin ji nêzik ve dişopand û haya wî ji rêzname û bernamaya rêxistinê jî hebû. Di avrêla 1945'an de Qazî Mihemed bû endam û serokê rêxistinê. Ji ber çekdarên ku Qazî Mihemed ew bi rêxistin kiribûn, Mehabad bûbû cihê, bê xirecir û teşqe, vê yekê jî bala axa û begên kurd zêdetir dikişand ser rêxistina JK'yê. Lê di sala 1945'an de li gorî hin çavkaniyan bi daxwaza Yekîtiya Sovyetê, li gorî nixandina Abdurrahman Qasimlo jî ji ber ku rêxistina JK'yê bersiva demê nedida, Partiya Demokrat a Kurdistanê hate damezrandin. Hemû endamên Komeleya Jiyanevey Kurdistan di nav vê partiye de cihê xwe girtin.



Li gorî nîrxandina hinek çavkaniyan bi nêzîkbûna dawîya şer re Sovyetistanê mijara Kurdan û Azerbeycanê germtir kir. Li gorî heman çavkaniyan Sovyetistan di warê neftê de li pey hinek destkeftinan bû, ew mijar jî li dijî hikûmeta Tehranê wekî çek bi kar dianî. Ev yek jî dibû sedem ku hestên azadîxwaz di nav kurdan de xurtir bibin. Ann Lambton di sala 1944'an de tê serdana Kurdistanê, ew dibêje: "Hemû kurdên ku ez bi wan re peyivîm, gişkan bi ços û heyecan çêlî serxwebûna kurdan dikirin."

Di kewçêra 1945'an de Mela Mistefa Barzanî tevî hezar şervanên xwe hat herêmê. Vê yekê hêzek mezin da tevgera azadîxwaz a kurd. Divê bê gotin ku nakokiyên eşîrî hê jî li ser gel bandor dikir, ji ber heman sedemê kurdên Rojhilat baweriya xwe bi Barzanî û hevalbendên wî nedianîn. Li gorî gotina İbrahim Ehemmed, rêveberên herêmê ew jî xwe re wekî bar dîtine û baweriya xwe bi wan neanîne, lê li ser hinek hewlên endamên Hîwa yên di nav Komeleyê de ev nakokî jî holê rabûne.

Di dawîya sala 1945'an de dewleta Îranê kontrola xwe li ser Azerbeycanê winda kir. Roja 10'ê berfanbarê Garnîzona Tewrîzê kete destê hêzên Partiya Demokratîk a Azerbeycanê. Hikûmeta Gel a Azerbeycanê hemû rojhilatê Azerbeycanê xist bin destê xwe.

Li aliyê din di 22'yê rêbendana 1946'an de "Dewletî Cûmhûrî Kurdistan ango Hikûmetî Millî Kurdistan" bi pîrozbahîyeke ku deh hezar kes tê de beşdar bûn, hate damezirandin. (Li gorî Qasimlo ev mêjû 24'ê rêbendanê ye.) Qazî Mihemed wekî serokê vê komarê hate hilbijartin, her wiha parlamentoyeke ku ji 13 endaman pêk dihat jî, hate hilbijartin. Li gorî agahiyan komara ku hate daxuyandin, ne komareke serbixwe bû. Bi awayê ku Abdurrahman Qasimlo di pirtûka bi navê "People Without Country (Gelê Bê Welat)" de dinivîse, jixwe di bernameya PDK'ê de xudmuxtari (otonomî) hebû. Her wiha dewleta Azerbeycanê jî jixwe ew herêm wekî erdê xwe nîşan dida, rayedarên Sovyetistanê jî li dijî dewleteke serbixwe ya kurdan bûn. Lê tiştê diyar ev e ku Komara Kurdistanê di karwanîyê de serbixwe bû.

Bi avabûna komarê re, perwerdehiya bi zimanê kurdî dest pê kir, weşanên wekî rojnameya Kurdistan, kovara PDK'ê Halala, Girûgalî Mindalan, Hîway Nîştîman dest bi weşanê kirin. Gelek pirtûkên perwerdehiyê jî farsî hatin wergerandin û di dibistanan de hatin bikaranîn. Her wiha ala neteweyî bi rengê sor, spî û kesk, li ser şerîda spî rojeke zer, li dor jî simbêlên genim û di navê de xame hate pejirandin. Roj sembola azadîyê û xame jî sembola girîngiya ku hêzên neteweyî didan perwerdehiyê bû.

Di 23'ê avrêla 1946'an de di navbera Hikûmetên Gel a Azerbeycan û Kurdistanê de peymanek hate morkirin. Di vê peymanê de biryara hevkarî, hevalbendîyê hebû. Hevalbendîya wan her du gelan jî bo berevaniya li dijî dagirkeran pêwîst bû. Di pirtûka navborî de Abdur-

rahman Qasimlo dide zanîn ku sirûda bi navê "Ey Reqîb" wekî sirûda neteweyî hatiye pejirandin, lê di çavkaniyên din de navê sirûdê nayê bilêvkin, berevajî gotina Qasimlo, kurê Qazî Mihemed Alî Qazî di bernameyê MED-TV de dabû zanîn ku ew sirûd, wekî sirûda ciwanan hatiye pejirandin. Piştî vê daxuyaniyê li

spartin hêzên dagirker. Qazî Mihemed di wesiyetnameya xwe de vê yekê wiha şîrove dike: "Bew hemû hoyewe ke le îxtiyarî min da bû, eger şerim kirdba, reng bû teneskeyn, belam bo emey ke Mehabad wêran nebêt û bo xatirî têdaneçûnî xelk, şerman nekird. Bew hemû maşên û helaney ke le îxtiyarim da he-

ranbûnê biparêze, nehiştîye ku çek biteqin, tevî ku zanibûye wê bê girtin û kuştin jî.

Komara Kurdistanê ku li herêmeke biçûk a rojhilatê Kurdistanê mezin hatibû avakirin û di nav sînorê wê de ji 10 milyon kurdan bi tenê milyonek hebû, ji ber gelek egerên hundirîn û derveyî tîk çû. Dîroknas gelek nîrxandinên cur bi cur li ser vê komarê û avakarên wê dikin. Aliyê erênî yê vê ezmûna tîkçûyî wiha tîk rîzkirin: Di warê perwerdehî, çand û weşankariyê de gavên bêhempa hatine avêtin. Di warê avêtina hin gavên demokratîk; wekî mafê jinan û toleransa ji bo hêzên dijber, ew ezmûneke erênî ye. Serokê komarê Qazî Mihemed bi rewşenbîrî, dilpakî û nefsbîçûkiya xwe helwesteke şayanî pesnê nîşan daye. Her wiha helwesta wî ya li dadgeha dagirkeran û li hemberî sêdarê jî mirovên kurd pê serfiraz dike.

Tiştên ku bûne sedema tîkçûna komarê jî tengbûna herêma ku lê ava bûye, bêtecrûbe û dilpakîya serokatîyê, lawazbûna rêxistina ku serkirdayetiye dike û nexweşiyên civaka kurd in. Bo nimûne serokên hinek eşîrên kurd du alî dilfizin, tîkiliyên xwe bi dagirkeran re nabirin, berî ku komar bikeve jî xwe didin aliyê dijmin. Dîsa dubendî û nakokiyên eşîrî nahêlin ku rêxistin û saziyên neteweyî yên xurt pêk werin. Kêmasiya herî mezin a serokatîya avakarên komarê, zelalnebûna dîtin û ramanên wan ên li ser doza neteweyî û baweriya wan a bêbingeh bi hêzên derveyî ye.

Serokomarê Komara Kurdistanê Qazî Mihemed piştî ku hate girtin, di dadgehan de dijmin darizand û bi tu awayî serî li ber wan netewand. Tê gotin ku heke wî bi çend rêzan jî Şahê Îranê lêborîna xwe bixwesta, wê bihata efûkirin, lê wî ev yek nekir. Qazî Mihemed ji dewletê tiştê nexwest, bi tenê dema ku wê bê darvekirin, ji ber ku li gorî baweriya îslamî xeniqîn nebaş bû, wî xwest ku bê gulebarankirin, lê ew daxwaza wî jî nehat pejirandin. Hêzên dagirkeran jê xwestin ku ew wesiyetnameya xwe binivîse, wî jî du wesiyetname nivîsandin; yek ji bo malbata xwe, yek jî ji bo gelê xwe, lê wesiyetnameya duyemîn ji aliyê hêzên dagirker ve hate veşartin, niha jî kes nizane ka çi tê de hatiye nivîsandin. Di wesiyetnameya yekemîn de bi van gotinan dixwaze ku tola wî bê standin: "Ewa emin be ehdi xom wefa ekem û ta êstaş le mêjû da nedîtrawe kesêk fêdakarîyekî way kirdibêt. Helbet le ser êweş pêwîst e minîş be xizim û kes û karî min wefadar bin û toley minîş bistênînewe." Roja 31'ê adarê katjimêr di 3:10 de Serokomarê Komara Kurdistanê Qazî Mihemed tê darvekirin.

#### Çavkanî:

1—People without a country, The Kurds and Kurdistan; 2—Mamostay Kurd, jimare 24, zistan û beharî 1995; 3—Kurdish Studies, hejmara taybet, bi boneya 50 saliya avabûna Komara Kurdistanê; 4—Modern History of The Kurds, David McDowall



Qazî Mihemed roja 31'ê adara 1947'an, saet 03.10'an de li Meydana Çarçirayê hate darvekirin

ser van gotinan çi lêkolîn çênebû, zelal kirina vê mijarê hêjayî lêkolîneke bi serê xwe ye.

Komara Kurdistanê ya Mehabadê 11 mehan li ser piyan ma, piştî ku leşkerên Sovyetistanê jî Îranê vekişin û Komara Azerbeycanê bêtî şer kete destê hêzên dagirker, leşkerên Şahê Îranê berê xwe dan Mehabadê. Rayedarên komarê piştî ku ji hewldanên xwe yên ji bo peymanekê destvala veşartin, bêtî şer bajara

bû, emtiwanî le Mehabad helêm û dû çarîş li wîtarekanî xom de be xelkî Mehabadim gut, emin demzanî eger helêm êreş wekû Tewrîzî lê dehat û tûşî kuştar û talan û biro debû. Emin be xelkim rageyand ke reng e bimgirin û bişimkujin, belam bo emey namûsî xelkî biparêzdîrêt û talan nekrêt helnayem û xom be qurbanî ewe dekem...."

Ji wan gotinan diyar dibe ku serokatîya komarê ji bo ku bajêr jî talan û wê-



# Gula Serhed, Embaza Serpil Yılmaz

**W**exto ke zerya kesî tewe-na kes vano qayê zarya kesî ra leteyê kewno. Fina weşîna ma ra, leteyê biryê; çimke zerya ma wa tewena û çimke nêweşxane de embaza ma ya delal û rindek Serpil Yılmaz şehîd kewt. Çend rojî rojnameyan de nêweşîna ci sero xeberî vejyay. A, roma reş dest de êşîr bî û Girotxaneyê Sakarya de rakewtê. Di mengî ra vêşî girotxani de pawitê ke, şira nêweşxaney û doxtorî nêweşîna ci weş kirê. La belê Roma reş keyneka kurd, şoreşgera reyayîne şarê ma rê weşî vêşî dî û wextê ci de a nêberdi nêweşxaney. Rojê peynî de Sakarya ra berdi Nêweşxaneyê Şişlî Etfalê Stenbolî û şewa sersal de mêjge ra emeliyat kerd. La belê, ganê ay teqet ra zaf kewtbi û vêşî xo ver nêda. Rojê 5'ê menga rêbendan de zerya ci vinderd û şehîd kewt.

Awûqat Eren Keskini rojnamegeran rê, qandê Embaza Serpili wina vat: "Serpil qeraranê xo de, keynekeka zaf şirêgnaye bî. Sifetê ci zey sifetê merdînan nêbi. Riyê ci, zaf rindek bi û bawerîna pir bi."

Ma piya Zankeyê Marmarî de wendê. A, Fakûlteya Musnekarîna Qeçikan de wendox bî. Kampûsê Göztepe de, ma pê silasna. Eke raşt yeno min vîrî, sera neway de amêbi fakûlte. Rind nîno min vîr ke, ma senî pê silasna. La belê a qet çimanê min ver de nêşîna. A dedkeyna Akif Yılmazî bî, coka min a qet xo vîra nêkerd. Embaza Serpil camêrdan ra çapik bî. Ay destê xo çekerde çiçi, girweyê ê çî rew qedînayê. Embazîna xo de jî zaf girêdayî bî. Wexto ke vatê heval, zek ci fek ra hazar heval vejyo. Heme çî ra vêşî, a embazanê xo rê nêverdayê. Ay cayê xo de jî, xo rê kar diyê. Ez bawer nêkena ke, şoreşî miyan de jew deqeyê ci jî, veng ravêrdê. Çirê ke weşîna ay zey awika Minzûr zelal, zey vayê Serhedî honik û zey tîja koyê Nemrûdî tim û tim reng û reng beriqiyayê.

Nêweşîya embaza Serpil o wext jî estbî, la belê hind vêşî nêbi. Çend finî vejya Medîko-Sosyal ke, doxtorî nêweşîya ci weş kirê. Bahdoyê hergi şiyin de, doxtoran cî ra çiyê vatê. Wexto ke nêweşîna tahde vêşî dayê ci, zaf qahriyayê û wina vatê: "Sereyê min tewena, ez nêşena vêşî çiyê biwana, zewbî jî na nêweşîna xo dana riyê min ro û riyê min pa kul bena. Min çiyê nê doxtoran ra fahm nêkerd. Haylo, haylo...."

Porê çî zaf tadeyê derg û siya bi. Jew fin embazan ci ra vatê: "No por çend ke to sere de bo, sereyê to yo tim jî bitewo. Eke tiya goş dana ma, xo nê

porî ra bixesle." Embaza Serpil nê qisan sero wiyayê û vatê: "Nêweşîna sereyê min miyan do, teber de niyo. Eza senî porê xo bêsebeb cikirî."

Embaz goreyê ser û bejna xo, tenekê kiloyin bî; la belê goreyê ê kiloyan jî zaf çapik bî. Embazan ci ra zaf hezkerdê. A xo ji hezkerde û entelîjan bî. Cok ra mabênê ay û embazan weş bi. Jew fin ma wiyayê û ci ra vatê:

Demirel, Selahattin Uçkardeş, Orhan Tekiner, Ibrahim Deniz, Hacı Dumanlıdağ, Emine Akkuzu, Halil Özalp û ê ke namê ci nîno min vîrî. Nê embazan ra her gi jewê ci, jew şarîstanê Kurdistan ra amebî û Stenbol de bibî jew gan. Wa aqilê ma kışta nê embazan ra veng nêmano. Wexto ke şar, jû keynek ra yan jî jû cinêk ra hezkeno; çî ra vanê: "Na çî canik a?"



"Tiya fina lox bena, se bî ke?". Nê kuşatanê ma ra ay xo qet nêtewnayê û neqahrnayê. Zek ma ci ra çiyê nêvato û namê pa nêkerdo, nermik nermik ver-pirsê ma dayê.

Wendoxên ke welatperwerî yê, sera newayin de Zankeyê Stenbol de bi, zey şoreşgeranê koyan de xeftiyayê. Her gi roj paykewtinê xo ya ters o gird dayê bandorkeran. Qelfeyê wendoxanê nê seran miyan de, kam çiniyo ke? Naci Donat, Cafer Demirel, Ali İhsan Uçkardeş, Müslüm Solgun, Yadigar Doğan, İhsan Güler, Derviş Kurd, İlhan Çiftçi, Çetin Sonkurt, Türkmen

Zey şitî pak û zelal a." Embaza Serpil jî, ê canikan ra jêw bî.

Jew fin ma ameyê pê hetek û hermanê Kurdistanî sero qisey kerdê. Ma embazanê xo ra, rewşê herêma ci mûsayê û silasnayê. Embazanê ma miyan de Serhad ra Serpil estbî. Rojê jew embazî ci ra vat: "Embaza Serpil kışta şima ra Şoreşgero silasnaye Akif Yılmaz estê. PKK'î miyan de, ca yê Şehîd Akif Yılmazî weş aysiyeno û partî de namê ci zaf ravêreno. Ti heqê ey de çiçi zana?" Na pers sero embaza Serpil tay bî sîr, zinciya xo ant û solix girot û verada; pey ra jî wina vat: "E,

embaz. Eza ey silasnena, her gi roj jî ez wazena tayna bisilasna. Ez çend ke xeftiyena hind jî bena nezdiyê ey. Piyê ci, ma ya ci û bera ci rind silasnena, la belê ez wazena fikranê ci rindêr bisilasna. Ez çend ke fikranê ci, weşîna xo de berz kira, hind jî bena nezdiyê ey. O lacê dedê min o, la belê ney ra vêşî, o embazê min bi. O rûmetê ma û rûmetê şarê ma û rûmetê şaranê bindestan pêrin o. Wexto ke min o diyê, ez zaf werdî biya, tayn tayn yeno min vîrî. Zindan de jî min finê di finî dî. Ez werdî biya, coka maya mi ez xo de berdê. Xo ra bê ma, kes nêşiyê ci hetek. Zek yeno mi vîrî, ey min ra hez kerdê. Ez nêwazena ebi namê Embaz Akif Yılmazî xo bida silasnayin; çimke ez bawera ke, şarê ma heme jî hindê min nezdiyê ê şoreşgeran ê. Ez wazena ebi weşîna xo ya, biba layiqê şehîdan. Kam ke vêşî, raya şoreşî de bixeftiyo; o beno embaz û malbata ê şoreşgeran. Wa zûrî nêbo, ez înan ra zaf kêfweş bena û rûmet gena. Wexto ke nameyê embaz Akif Yılmazî ravêreno, zerya min girêyena." Wexto ke ay Akif Yılmazî sero qisey kerdê, zek cayê xo de bipero.

Ma pê ra, sera neway û jewî de abiryayî. Bahdo min a qet nêdî. Panc serî tepya, ez pa hesyawa ke sînorê Yewnanîstan de 29'ê gelawêja 1996'î de tepişyawa û arda Stenbol. Nê panc serê ci kotî de ravêrd, no mabên de se kerd, ez xo nêzana. La belê rojnameyan de min mahkemanê ci (dûrî ra bo jî), çimîn kerdê. Ay peyniyê mahkeman de, sera 1997'in de 15'ê tirmeh de îdam girot. Mahkemaya bandorkeran cezayê ci îdam ra vurna muebetî. Wexto ke a şehîd kewt jî, dawa ci mahkema cor de pawitê. Embaza ma ya rojnameger vînayîne xo yê mahkema wina ardê ziwan: "Serpil wexto ke ameyê mahkema, xofê ci kewtê zerî. A, xo ser de zey polatî vinderdê. Awiranê xo qet nêxeripnayê û fikiranê xo ra gamê jî pey ra nêçekerdê. Ay dewlet wîja de, mahkema kerdê. Rojnamegerê bînan vatê: "Na keynek PKK'ê ra ya, çimke a qet milê xo mahkema ver de çewt nêkena û çimke a zaf tesîr dana kesî." ez vana, aya tim û tim weş bimana, û ez vana na heqê ay a."

Embaza Serpil, hetê welatperweran û malbata ci ra, roja şeşê rêbendan de Stenbol ra, ebi zilgitana, hela peynî de kewt raya Kurdistan. Rojo bîn de, dewa ci Bêşîktaş de şarî ebi koma heraya, a dayî hera sîr, hera Kurdistan. A ebi rûmeta û weşîna xo ya rinda bî tewrê qelfeyê şehîdanê Kurdistanî.

Weşêr bo to rê, gula Serhedî!



□ 17-23 rêbendan:

**Komara Mehabadê hate damezirandin**

Komara Kurdistanê ya Mehabadê di bin serokatîya Qazî Mihemed de li Rojhilata Kurdistanê hate damezirandin. Li gorî dîrokanan ev yekemîna dewleta hemdem a kurdan e. Hin kes hene ku dibêjin kurdan bi tenê di dîroka xwe de dewleteke temenkurt damezirandine, ku ew ji Komara Kurdistanê ya Mehabadê ye. Piştî damezirandina komarê di demeke kurt de lîsteya lijnaya wezîran hate pejirandin, Qazî Mihemed bû serokomar.

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**

□ 21 rêbendan 1924:

**Lenin çû ser dilovaniya xwe**

Sazûmankarê Yekîtiya Sovyetê û rêveberê tevgera sosyalîst ê dema xwe V.I. Lenin di sala 1871'ê de li Sibiryayê hatiye dinyayê. Di sala ev 1898'an de dikeve nav refên Partiya Sosyal Demokrat a Karker a Rûsyayê (SDWPR). Di vê demê de rojnameyeke bi navê Iskra (çirûsk) derxist. Lenin bi gelekê kirin û têkoşînên manîdar tevdira têkoşîna 17'ê kewçêrê (oktobir) kir. Vladîmîr îliç Ulyanûf Lenin di 24'ê berfanbara 1924'an de çû ser dilovaniya xwe.

# Ji NÇM'ê şahiyeye kurdane



Roja 11'ê rêbendanê 1998'an de li şaxê Bağcılara HADEP'ê ji hêla xebatkarên NÇM'ê ve bi navê 'Sersala we pîroz be' bernameyek hate amadekirin. Gel bi coşeke pir mezin beşdarî di vê şahiyê de kir û mirov digot ka 'salon' nema têrî gelê kurdîke. Bernameya bi navê 'Sersala we pîroz be' ji hêla endamê Teatra Jiyana Nû Yıldız Gültekin ve hat pêşkêşkirin. Di destpêkê de şanogerên şanoya Hêvî lîstika 'Kosegelî' ku mijara wê li ser sersala ye pêşkêş kirin. Bi wê lîstîkê re bêguman gelek kesên beşdar, xwe dîsa li welatê xwe dîtî û sersalê bi vî rengî jîyan. Piştî re jî endamê Teatra Jiyana Nû Murat Bağî hat ser sahnê û wiha got: "NÇM tiştên ku ji we girtine dîsa pêşkeşî we dike. NÇM bi xebata xwe dibe hêjayî piştigiriya we. Em sersala we pîroz dikin. Gelo sal çi ye? Gelo zemanê me, zimanê me heye? Di sala par de tiştên ku me bi dest xistine çi ne? Îro tiştê ku em dibînin koçberên kurdan, penaberên kurdan in. Dixwazin her dem kurd bimirin. Lê rengê mirinê çi ye? Rengê mirinê heta nebe rengê azadiyê reş e... Em dizanin ev sal salên serketinê ne. Her sal me bêhtir bi ber azadiyê ve dibe. Çawa ku em li zimanê xwe xwedî derdikevin, em ji îro pê ve li zemanê xwe jî xwedî derkevin. Divê em muhasebeya xwe bikin. Li zemanê xwe, li zimanê xwe û li çanda xwe xwedî derkevin."

Piştî wan gotinan tiştêkî cihêreng çêbû. Ji

Şanoya Hêvî Gafur, ji Teatra Jiyana Nû Yıldız û Ronahî bi awayekî şareza dengbêjî kirin. Ev ji hêla beşdaran pir hat ecibandin. Dawî li ser navê malbatên girtiyan Ali Doğan axivî. Doğan di axaftina xwe de bal-kişand ser greva birçibûnê û got: "Ez eceb dimînin. Ji Ewropayê tî wê derê ji bo greva birçibûnê. Lê mixabin em li vir tiştêkî nakin. Divê em bêdeng nemînin û li hemberî lîstikên serdestan tîbikîşîn."


Bernameyê, bi stranên Koma Çiya û Vengê Sodorî dom kir. Piştî re koma folklorê NÇM a bi navê Koma Serhildan bi lîstikên xwe beşdar kêfxweş kirin.

Car caran, mesajên ku ji şevê re hatibûn ji hêla Yıldız Gültekinê ve hatin xwendin. Yek ji van jî a Komeleya Xebatkarên Avahiyan (Înşaat Çalışanları Derneği) bû. Vê komeleyê di mesajên xwe de digot: "Dema kedxwar dixwazin netewekê ji holê rakin, pêşî zimanê wê, çanda wê û dîroka wê ji holê radikin. Ji ber vê yekê divê em li zimanê xwe û li dîroka xwe xwedî derkevin." Bi dû van mesajên re endamê Şanoya Hêvî lîstika bi navê 'Kurmê Darê' lîstin. Bernameya sersalê ya NÇM'ê bi mesajên; HADEP'a Kağıthane, GÖÇ-DER, İnisiyatîfa Komeleya Jinên Azad, Esenler Emekçi Halkın Birliği û xwendekaran û wekî Atılım û Özgür Gençlik xelas bû.

ŞEXMÛS-ÖNAL

**ÇAVDÊRÎ**

## Projeya welat û şexsiyetên xwe nas bike



MÎRHEM YÎGÎT

Ev çend meh in wekî Înstîtûya Kurdî li Stokholmê me dest bi projeyekê kiriyê. Navê vê projeyê, "Projeya welat û şexsiyetên xwe nas bike" ye. Proje biçûk e, hêsan û bêmesref e. Lê belê binirx û bikêr e. Em bi nivîskar, şexsiyetên welatparêz, jîyan dewlemend û xwedî serpêhatî re hevpeyvînan çêdikin. Van hevpeyvînan em digirin kasetên teybê û em wan arşiv dikin.

Hêjmerek pirsên me hene. Ev pirs piştî li ser karkirineke çend mehî hatine amadekirin. Pirs girêdayî jiyana şexsî, aborî, civakî, siyasî, kulturî û penaberî ya li derveyî welêt in.

Pirsên tîne kirin tevî yên amade û yên di nav pirs û bersivan de derdikevin, zêdeyî 100 hebî ne.

Zemanê hevpeyvînan bêsinor e. Hevpeyvîn bi bêhneke fireh tîne kirin û carinan çend-rojan an jî çend rûniştinan dixwazin. Divê mirov bi sebir û bi disiplin be, zû bi zû sar nebe û dev jê bernede.

Hedef û stratejî ev e; Çendî pirs zêde û hûr bin û çendî bersiv fireh û pîralî, bi detay û kîtekî bin ew çendî baştir e.

Kasetên me 90 deqiyeyî ne. Ji meha 9'an a sala 1997'an û vir de me zêdeyî 100 kasetî dagirtine û me bi 150 kesî re hevpeyvîn çêkirine.

Ewropa tije kurd e. Ji her parçe û herêm, eşîr, birek û zaravayî kes û şexsiyet hene. Sînorên dewletên dagirker li vir tunene û destên dijminan jî bi dereca li Kurdistanê heye nagihê vir.

Ji bo ku em "Projeya welat û şexsiyetên xwe nas bike" bidomînin îmkân bêdawî ne û rezervên li ber destan qet naçikin. Mesele dimîne mirov bikêr bê, hez ji vî karî bike û zewq û dilxweşiya ku karekî wiha mide hîs bike, bijî.

Bi riya pirs û bersivan mirov pir tiştan hîn dibe û zêdeyî texmînan li tiştên gelekî hêja rast tê. Mirov nivîskarên xwe, bi riya wan neteweya xwe, sosyoloji û avahiya gelê xwe, cografya û pirs û pirsgirêkên xwe bi rengê herafî û mîna ku yek ta bi derziyê ve bike, nas dikê.

Ev hevpeyvînan tîne lidarxistin û arşivkirin dê sibe li pêş bibin malzeme û materyalêkî bêqedar giranbîha. Nivîskar, romannivîs û her cure lêkolînerên dîrok, ziman, zarava, kultur û folklorê me dê ji vî arşivê rojekê muheqeq karibin kelle werbigirin.

Em vî karî hê wekî karekî ji çend karan dikin. Di nav çend mehan de û piştî 25-30 hevpeyvînan me nas kir ku ev xebat wextekî zêdetir dixwaze.

Tu li eslê wê bînerî ji vî xebatê re ekîbekî mezintir divê. Di nav bunya her Înstîtûyê me de pêwîst e çend kes jî di ber re hevpeyvînan hatine kirin û kasetên qeydkirî deşîfre bikin. Nivîsandin jî divê li gorî babetên xwe bêne beşkirin, kategorîkirin û di cih û refên taybet de bêne hilanîn.

Bûyer û rûdanên 40-50 salên dawî li Kurdistanê û tecrûbeya çend cilên van salan di bîr û hafîza nivîskar, rawêşbîr, şervan, kadroyên siyasî û welatparêzên kurd de embarkîrî û hilanî ne. Kurd nanivîsîn, kêr dinivîsîn. Heger mirov kampanyake xurt a hevpeyvînan veke û hinekî li ser mistewake firehtir vî karê biçûk ku em Stokholmê dikin, li gelek cihên din jî bike û li derve û hundir tîxe kar, dê piştî çend salan xezneyeke wiha derkeve meydanê ku ji giş dolar û markên dinyayê biqîmetir be.



# Çîroknivîsê Başûrê Biçûk Pênûsa dûrî rojevê, berhe

**D**i çîrokên we de rojev, rewş gelek caran bi awayekî fotografî derdikeve ber çavan, mirov dikare bibêje stûna çîrokê dibe hîlbijartina bûyerên ku di rojevê de diqewimin?

◆ Di nêrîna min de rojev dibe bingeha her karekî hunerî, her pênûs li ser rewşa hawîrdora xwe diaxive û ji wê rewşê derdikeve. Pênûsa ku têkiliya wê bi rojevê re tunebe, ew pênûs wê ziwa bibe, wê bimîçîqe, yan jî tu karê toreyî yê bilind û nemir nade. Pênûsa ku ji kulê mîletê xwe şuştî be, ew dê zû li ber can bide. Lê wekî te pirs kir, gelo çîrok dibe hîlbijartina bûyerên ku di rojevê de diqewimin? Bersiva min 'Na' ye. Ne her bûyer bi rengê ku di rojevê de diqewime, dibe ku ev kar ê yekî rojnâmevan be, ku li pêşiya nivîsandina hevpeyvînekê be. Lê çîrok û roman ji rengê din in, di van celebên toreyî de, torevan li pêşiya afirandina rojeva nû ye, rojeva hunerî, ji ber ku her torevan gerek 'fabrîkeyek' di hinavên wî de peyda bibe. Wan bûyeran tê re derbas bike ta ku ew bûyer tê de bikelin, heta bigihên an bistewin, li gorî nêrîna wî û hostahiya wî û jêhatîbûn û pêlewaniya wî karekî toreyî bedew bide. Wekî çawa em bi xweşbûna hingiv dihesin, piştî hostahiyeke bilind di afirandina wî de û piştî hîlbijartineke taybet ji xwedîya wî, ku ji gul û çiçekên ku şîravê jê bimerêse, hildibijêre. Torevan qet nabe wênekêş, nabe ku armanca wî bibe girtina wêneyên bûyerên rojevê.

*Gelek caran di nava çîrokên te de tinazî, laqerdî, serê xwe bilind dîkin. Ligel ku çîrok bi tevayî bi şeweyekî trajedîk tê ristîn û bûyer di nav reşahiye de avjeniyê dike.*

◆ B.Brecht digot: "Gava bûyerên trajedîk pir dibin, peyv û axaftin li ser tiştên pak û bilind pir dibe." Û yê me jî bûyerên trajedîk di rojeva me de pir dibin, lê mixabin hinek hene ku li çepikan dixin. Navê derewê kirine rastî, yê tirsê kirine mîrxasî. Xelkê birçî dîkin û ji wan dixwazin ku destê xwe di ser zîkê xwe re bibin û bibêjin 'spas! ji we re'. Navê revê bûye êriş. Bajaran bi çekên kimyewî dişewitînin û alên demokrasîyê bilind dîkin. Li ser xencera bi xwîn digirin û laşê bêcan berê wî didin dadgehê. Di rojevên wiha de tinazî serê xwe hildidin, tinaziyên reş, laqirdiyên ku hêşir û kenê te li nav hev dixi- ne. Tinazî di çîrokê min de ne gotîneke beloq e ku bi darê zorê kenê te bîne. Yan sixêfeke bi qîrêj e yan jî pêkeno- kek e, ez di nivîsandina xwe de rast im heta dawiyê. Tinaziya mezin temaşeki-

**Ji sed û çil rûpelî nêzîka çil rûpelî ji pirtûka destnivîsa min "Xwîna Pismam" hate qedexekirin ji hêla yekitiya nivîskarên ereb ve. Sedema vê qedexekirinê çi bû? Bi baweriya min ji ber ku bêhna kurdayetiyê ji wan difûriya. Heta navê pirtûkê xwestin ku ez biguherim!... Ev problemên ku tên pêşiya me, ji hêla nivîsên min ên kurdî ve.**

rîna xelkên bêdeng li vê xwîna ku dihe- rîke.

*Çîrokên we tev bi zimanê erebî hatine nivîsandin. Tevî ku hûn bi kurdî jî dizanin, çima heta niha, hûn nêzîkî nivîsandina bi zimanê dê nebûne?*

◆ Hinekî dereng ez û nivîsandina bi zimanê kurdî li hev rast hatine. Dibe ku te heta vê demê tu çîrokê min ên ku bi zimanê dê hatine weşandin nexwendine. Lê ez dikarim bibêjim ku destnivî- seke min ji çîrokan bi zimanê kurdî amade ye ji bo çapê. Ez dibêjim, sedemên ku nêzîkbûna me tevan ji nivîsan- dina bi zimanê kurdî dereng hiştin, ji me ve xuyan e. Nêzîkbûna min ji çîro- kê re; çî bi erebî, çî jî bi kurdî, tu lez û bez tê nebû, ji ber ku ez bi tirseke me- zin li pêşiya spîbûna pelan disekînim. Lewre di nêrîna min de karê toreyî ka- rekî pir berbiçav e û pir pêwîst e ku em bi erzanî nêzîkahiyê lê nekin, dibe ku çend pirtûkên di warê çîrokê de hatibin çapkirin li Sûriyeyê, wan hinek mîrxasî da dest min ku ez bi zimanê kurdî çî- rok û gotaran binivîsînim. Daxwaza min ew e ku bilindbûna çîroka min a kurdî li gorî bilindbûna bejna hêviyên min be.

*Çend navên balkêş di çîroknivîsîna erebî de, li Sûriyeyê derketine ku ew bi xwe kurd in. Der barê nivîskarên kur- dên ku bi erebî dinivîsin de, hûn çi dibêjin?*

◆ Ez dikarim bibêjim; Nîroz Malik, Mihemed Baqî, Ehmed Umer, Ebdul- baqî Yûsif, Helim Yûsiv û Xorşîd Eh- med di warê çîrokê de û di nivîsandina helbesta bi erebî de Brahîm Yûsif, Ta- ha Xelîk û malbata Huseynî li Amûde

çend heb ji wan kesan in. Hebûneke van tevan îro li Sûriyeyê heye û sedemên ku van kesan ji ber wan rahîst pênûsê û bi zimanê erebî bi kar bînin, ev sedem xuyan e. Wê tewştir bûya eger van tevan bi kurdî binivîsanda, lê ez di wê baweriyê de me ku gelek ji van na- van nikarin alfabeya kurdî ji hev vekin. Di rewşeke wekî rewşa van kesan de gelo gunehê wan çi ye? Û çend xwendevanên zimanê kurdî îro li Sûriyeyê hene ku dikarin berhemên wan bixwî- nin? Ji vê yekê ez nabînim ku karê wan yê toreyî karekî seqet e, gava xelkên li dora wan di dilê wan û nivîsandinê wan de bijîn.

*Hinek mînakên din hene, wek ni- vîskarên Cezayirê yê frensînivîs, hi- nek berhemên wan di hundirê toreya Cezayirê de dibînin û hinek wan li derveyî vê xelkê dibînin. Berhemên kurdên tirkî-farîsî-erebînivîs dimînin perçeyek ji toreya kurdî an na?*

◆ Bêguman berhemên wan parçeyek in ji toreya kurdî gava wêneyê ge- lê kurd di wan berhemên de were xuya- kirin (gava kesên ku di çîrok û romanên wan de tevdigerin kurd bin, bi hêviyên xwe, bi psikolojiya xwe, bi girê ku di dilên wan de kom bûye, bi adet û rabûn û rûniştina xwe kurd bin) cihê wan ke- san divê kurdî be, bi girên xwe, bi gul û dar û avên xwe, bi nav û çiya û best û ezmanê xwe, kulê wan yê kurdan bin,





# Xorşîd Ehmed: Nên nemir nade

**Çîrok û roman ji regekî din in, di van celebên toreyî de, torevan li pêşiya afirandina rojeva nû ye, ji ber ku her torevan gerek 'fabrîkeyek' di hinavên wî de peyda bibe. Van bûyeran tê re derbas bike ta ku ew bûyer tê de bikelin, heta bistewin, li gorî nêrîna wî û hostahiya wî û pêlewaniya wî karekî toreyî bedew bide.**

min amade ne û li hêviya weşandinê ne, yek bi navê "Xwîna Pîsmam" e û ya din jî bi navê "Dawîya Xewnekê" ye. Û ji bo çapkirina wan min erêkirina yekîtiya nivîskarên ereb standiyê. Lê ez bawer dikim ku wê di malikên maseyê de baş razên, berî ku ew berê xwe bidin çapxaneyê.

*Li Başûrê Biçûk rewşa çîroka kurdî; çi bi erebî be, çi jî bi kurdî hûn çawa dinirxînin?*


❖ Wekî te got, li Sûriyeyê, çend navên balkêş di çîroknivîsina erebî de derketin ku ew bi xwe kurd in (N.Malik-E.Rehman Sîdo, M. Baqî Mihemed-E.Baqî Yûsif-Ehmed Umer-Helîm Yûsiv û Xorşîd Ehmed), pirên van navan hebûneke wan î giran di warê çîroka erebî li Sûriyeyê heye. Heta ku tu rexnegirê çîroka nûjen li Sûriyeyê nikare wê rexne bike bêyî ku bi dirêjahî li ser van navan raweste. Ji ber ku bi rastî hinekan ji van şûna tiliyên xwe di çîroka erebî de hiştine. Li gorî bilindbûna van navan tu çîroknivîsên ku bi kurdî dinivîsinin, nehatine der. Ji ber ku pir kesên ku nêzikî nivîsandina çîrokê dibûn ne sedemên toreyî ew ber bi çîrokê ve diajotin. Çîroknivîsên kurd li Sûriyeyê dibe ku kêmîrî tiliyên destkî bêne hejmartin. Mirov dikare bi rihetî berê tiliyê ber bi qelsbûna huner û teknîka çîrokên wan ve bike. Çîroka kurdî li Sûriyê negihiştîye..... bi rastî, çîroka qels e. Bi siyaseta dagirtî ye û bi huner perîşan e. Û di nav dilpakîyê de windabûyî ye. Zimanê hinekan jî dibe tilîsman (Telsem-Luxuz) wekî zimanê Heybet Bavê Helebçe. Bi kurtî ew e rewşa çîroka kurdî li Sûriyeyê.

*Wekî nivîskarekî kurd, çi asteng li ber nivîsên we derdikevin, hûn dikarin hinekî rewşa nivîskarekên kurd bînin holê?*

❖ Ji sed û çil rûpelî nêzîka çil rûpelî jî pirtûka destnivîsa min "Xwîna Pîsmam" hate qedexekirin ji hêla yekîtiya nivîskarên ereb ve. Sedema vê qedexekirinê çi bû? Di bawerîya min de ji ber ku bêhna kurdayetiyê jî çîrokan difûriya. Heta navê pirtûkê xwestin ku ez biguherim!... Ev yek jî problemên ku tîrê pêşiya me, ji hêla nivîsên min ên kurdî ve. Ez dibêjim ku kesî rê li pêşiya me xweş nekiriye. Em di erdekî beyar de cot dikin û gava pêşî her dem dimîne girîng. Nivîskarên kurd li Sûriyeyê her yekî berê wî bi hêlekê de ye, hevgirtî neke nivîskaran tuneye, her yek dibêje ez. Em di jîneke destpêkî de dijîn. Kurd cengawer in li ser tiştine biçûk, her yek xencera xwe jî bo qirika yê din disû.

Gelek ji wan ketina bin sîwana "siyasiyan" bi nerînên teng tîrê hemberî hev û ezîtiyê ew kuştine.

*Ev demeke... hûn di kovara "Mewasim" de di-*



XORŞÎD.EHMED;

*di sala 1960'î de li gundê Nesran, li herêma Qamişlo ji dayik bûye. Li Zanîngeha Helebê, xwendina endezariya elektrîkê kuta kiriye û bi zîmanê erebî û kurdî dinivîsîne. Berhemên wî: "Nesran û panavên din (çîrok, Şam-1993) û di destê wî de jî du destnivîsên çîrokan bi zîmanê erebî heine; "Dawîya xewnekê" û "Xwîna pîsmam"*

*xebitin, ev kovar bi erebî derdikeve (li Qamişlo) û nivîskarên kovarê hema tev de kurd in. Rola vê kovarê di nav xelkên me de çi ye? Çi armanc jî derxistina wê hebûn?*

❖ Ji bo ku ez pîrsa te ji te re rast bikim, ez dixwazim ku tu bala xwe bidî van navan: Elî Ersan, Mihemed Neqîm, Tûma Tûmas, Semîr Denxa, Rîmon Macûn, M. Ebu Xeddûr, Seher Silêman, Muffîd Xensê, Hisên Sibahî, Xazî Cendelî, Cak Şemas, Zûhêr Xanim û Wecîh Casir. Ev koma nava wekî tu dizanî tev de ne kurd in û ev tev jî nivîskarên kovara Mewasim in. Çi kovar gava tê der armancên wê hene, daxwazî kesên li pey deranîna wê hene, yek ji armancên Mewasim ev e ku folklorê kurdî, toreya kurdî û jiyana miletê kurd bi xwendevanên ereb ên li Sûriyeyê bigoşînin. Li pey deranîna Mewasim sedemên toreyî û hunerî jî hebûn. Hêviyên me ew bûn ku ev kovar bibe ya her pêşîyê windabûyî, bibe ya her kesên ku dergeh di pêşiya nivîsandinên wan de hatiye girtin, daxwaza mezin ku

pênûsên nivîskarên kurd karibin hevpeyvînekê bi nivîskarên ereb re bikin, em dixwazim ku her kes mafekî xwe di hundirê vê kovarê de bibîne. Yek ji mafên kurdên li Sûriyeyê mafê rewşenbîrî ye. Mewasim bi hêvî ye ku karibe, nêzikî beşekî bi zîmanî kurdî jî biweşîne.

*Daxwaz û hêviyên her nivîskarî pîr in. Panav (mesafat) di navbera daxwaz û rojevê de heye?*

Kurd dibêjin: "Kesî bi xweziya ranehiştîye baqê keziya". Ji ber ku panavên di navbera daxwaz û rojevê de jî dirêj û kûr in. Daxwaza min wekî nivîskarekî kurd ku miletê kurd karibe li kêleka miletê ereb û tirk û ecem serfiraz û serbixwe bijî. Û ez jî karibim gaweke di pêşveçûna toreya kurdî de biavêjim û bi taybetî di warê çîroka kurdî de û em tev bi hev re karibin bigeheke xurt û asê çêkin ku ew kesên bi şûn me ve werin karibin avahiyeke toreya kurdî berbiçav ava bikin.



# Helbestine bijarte



Mirza Mehmet Çimen

## XENCÎ TÊKOŞINÊ TU RÊ TUNE

Dijmin xwe ser ve nahisîne  
Protesto bûye ku nebûye  
Protestoya teres gere bi şer bî  
Ji bo gelê Kurdistanê li piya bî  
Wek şehîdê nemir Mihemed

Ax ev çi bêdengiye bû edet  
Em dîsa wekî çarin ji caran  
Em dîsa bigazîrî kirin û hawar  
Êdî ne bes e wekên şehîd Mihemed!

Te ji bo gel xwe-şewitand  
Şehadeta te wek şurê tûj  
Li dilê dijmin ket  
Wekî tîrên piştî jûj  
Ez axînim ey şehîd Mihemed

Ha ez ha tu ji bo gel here  
Yek ji me biçe ser dilovaniya xwe  
Em wîqas rûmet didin hev  
Em gere yekbin wek heval Mihemed

Tiştêkî pir dijwar e bêdengî  
Xencî têkoşinê tu rê tune  
Bêdeng bimîni dor bi dore  
Deng bilind be tu kes bi te nikare  
Wekî banga şehîd Mihemed

Te gelek deng bilind kir  
Ji bo çareserîya bêdeng  
Ewê di xewê de te lê kir bang  
Belê rêheval Mihemed.

Ehmo Geliyê Zilan  
(Karkerekî înceatê)

## KULİYÊN XWÎNMÎJ

Dîsa bihar hatiye kezeba min dişewite  
Ne teyrek li ezman difire  
Ne dareke şîn dibînim  
Ne jî dengê keriyên pez tê min,  
li van zozanên wêran.

Hêlîna çûkan hilweşiyaye  
Êdî naxwînin ser rêl û zinaran

Ez dîsa dihelim meha adarê hatiye  
Dê bibişkivin sosin û beybûnên  
zozanên jor

Lê ez bi keser li benda vegeza welatê  
xwe me

Dikelim kesek nîn e bizane  
Ji evîna dilê min  
ezê ji kê re vekim

Kî heye germahiya dilê min hambêz û  
derman (bi)ke

Bese êdî ey felek!  
Tu ne ji xwedê ditirsî, ne ji mirovan  
şerm dikî.  
Sosin û beybûnên Kela Memê bexudan  
nabîşkivin.

Mîna hinara kevir lê ketiye  
Tev belavbûne ji hev  
Reng û rengên van kulîlkan  
Li vê zeviyê ji firêze geş nabin.

Xewên şevan li me nayê  
Rondikên çavan ziwa bûne  
Xew nakeve çavên me  
Ji kul û kedera kulîlkan tî

Li dojecha Nînovayê  
Bi serê xwe çilmisî mane  
Xwedê xirab bike van strî û kelemên  
Li vî welatî bûn asteng

Kewên xayîn di rikê (qefes) de  
Ji azadiyê çi dizanin  
Ne Kuliyên! xwînmij ji Kulîlk xwarinê  
têr dibin  
Ne jî agirê dilê min ditemire  
Seyda/Goyan

## KIŞTA AWEW CIZÎRE

Beynete dê Sasonîw Pasurî de  
Şewêk  
Kîştî çem dê Sinda'de  
Niyam dê baxçeyêk de vereşanêk  
Awa zelala çemî  
Û virîsiya vereşanî  
Virîsiya koyana siyawa k'elî  
Herêêêê.... herê qurban!  
Ti qet bi qaçaxî şiyê cennet û peyser fe-  
teliyayê  
To qet di bindê ezmanêkdê k'elî û  
Kîştî awê da weşike  
Çemdê Xoşabî de  
Vereşanêk  
Bîndestê Kelade çay werda  
To qe niyamê vengolê pêlda cuda gol-  
de Wanî de  
Kelada Wanî de  
Weşikî  
Egittiya  
Şardê Cizîrî diya qe qurban  
Herêêêê..... herê qurban!  
Qurban belêêê..... belê!

Hacı Qadirê Pasurî

## TI NÊNA

Wesar herediyawo çimanê to de  
Germinî bi tîcî tenya nêbena  
Serd bido pero, balesyenê  
Vilên ku riyê to de benê a.  
Hadê verade porê xo  
Wa honikayî şanî pero do  
Ez derg aniyena reyan ra  
Belkî nişkava ti bêrê  
Bêhêvî...  
Ti nêna  
Tamê nêamayişê to hawo lewanê min  
de  
Tenê min de hîbûna mişkerdinê to niya  
Ê varaniya enka  
Bêre...  
Wa dicey bo şewe  
Sipeyiyê vewre wa deko miyan  
De bêre...  
Wa çimanê to de bihewo heme çi  
Wa rî to de biyo wesar  
Û çemî ravêrê, vilî akêrê  
Bê...  
Pêlên zerê min çîrê biviraziye?  
Nêbeno, bêre  
Wa bi tenê nêbo ena hewe  
Û wa qe, ez lazê to de bibî bixar

Fehim Kaya

Werger: Roşan Lezgin

## JI AXFIROŞAN RE

Hûn in her tim di xezeba xwedê de  
Cih tuneye bikevin hûn di dîroka dinê  
de  
Îdrîs, Rêber, Diyaş axa ber çava de  
Lanek bê hezar lanet jiyana ku hun tê  
de.

Ax, welat, gel û xwînfiroşbûn  
Carna di sinê daax, carna sepetê de  
serfiroşbûn  
Kirin wêran Dêrsim, Ooçgirî, Pîran  
Lê dîsa nebûn ji dijmin re dost û yar  
Girtin avêtin weke çapûtê kan.

Al di heştê de dîsa di destê wan de  
Wan dest pê kir di berxwedana kelê de  
Armanç, bawerî û hevaltîbû di bin  
destê de

Xayîno dîsa nebû! Berxwedan di destê  
Mazlûm û Xeyrî de

Hûn îro dîsa di holê de, li ser navê  
Berzanî de  
Birîndar û keç kuştin heyê, bi hovîti wê  
kitêbê de

Bersiv disin ji xiyaneta we re  
Bi Zilan, Rewşen, Bermal û Kendal di  
dilê de

Bîr nekîn! Cih tuneye bikevin  
Hûn di dîroka dinê de

H. Pêçar



Li NÇM'ya Stenbolê

- 17.01.1998 **Şemî**: Şanoya Teatra Jiyana Nû: "Komara Dînan: Şermola", saet: 14:00  
Defîleya Yekîtiya Malbatên Mezopotamyayê, saet: 17:30
- 21.01.1998 **Çarşem**: Gotûbêja "Li ser Bira Qederê û romana kurdî."  
Axînger: Mehmet Uzun, İsmail Gölbaş, saet:18:00
- 22.01.1998 **Pêncşem**: Şevên Toreyê, Amadekar: Jiyana Rewşen, saet: 18:00  
Li MED-KOM'ê
- 17.01.1998. **Şemî**: Gotûbêj: Rewşenbiriya kurdî û pêşketina wê ya dîrokî.  
Dr. Ziya Ekinci, saet: 16:00

**CALAKIYÊN HEFTEYÎ**



LI BEKSAV'ê

- 17.01.1198 **Şemî**: Panel: Li ber afata nukleer. Axînger: Ayşe Gül (Platforma li dijî çekên nukleerî). Temel Demirer (Rojnâmegeher û nivîskar).
- Huseyin Yeşil (Menzela Endazyarên Elektrîkê) Pêşkêş: Zeynep Bilgin, saet: 15:00  
Li NÇM'ya İzmirê
- 23.01.1998 **Yekşem**: Panoramaya 97'an Dad, Huner, Mafên Mirovan.  
Axînger: Kazım Aslan (Ûlkede Gündem),  
Ercan Demir (Serokê İHD'ya İzmirê)  
Av. Zeynep Sedef Özdoğan, Saet:18:00

**"Bêdeng ma, dor hate wî!"**



Ev demeke dirêj e, hîndekarê lêkolîner ê Zanîngeha Mêrsînê Hakan Küçük, ji ber ku ji kar hatiye derxistin, dest bi greva birçîbûnê kiriye. Dîsa sê hevalên wî jî, ji bo ku piştgiriya wî kirine ji kar hatine derxistin.

Zanîngeha Mêrsînê berî vê bi demê, bi helwesta xwe ya li dijî YÖK'ê, piştgiriya raya giştî ya demokratîk wergirtibû. Ji ber vê yekê, wekî zanîngeheke demokratîk û pêşverû tê nasîn. Li aliyê din ev demê e, zanîngeha navborî bi greva birçîbûnê ya hîndekarê lêkolîner Hakan Küçük di rojevê de ye.

Hakan Küçük, roja 27'ê sermaweza 1997'an, ji ber ku ji kar hatiye derxistin, dest bi greva birçîbûnê kiriye. Pişt re demê ji bo hevdişînan navber daye çalakiya xwe. Lê, ji ber ku tu encam ji hewla wî derneketiye, roja 16.12.1997 dest bi rojiya mirinê kiriye. Lê, li gorî ragihandinan rêveberiya Zanîngehê polis dawetî kampûs kirine û Hakan Küçük ji kampûsê derxistine. Li ser vê yekê hevalên wî û endamên beşa wêje û zimanê îngilîzî, Malik Atış, Ali Dündükçü û Mustafa Karaoğlu jî, ji ber ku piştgiri dane vê çalakiyê ji kar tên avêtin.

Her çiqas Rêveberiya Zanîngeha Mersînê wekî sedema ji kar derxistina Hakan Küçük, amadenekirina tezê nîşan dide jî, Malik Atış, Ali Dündükçü û Mustafa Karaoğlu li dijî vê yekê derdikevin. Ew didin zanîn ku, serokê beşa wêje û zimanê îngilîzî Prof. Ayhan Sezer, di kombûna kargerîya zanîngehê de gotiye ku "An ew an jî ez. Nexwe ezê digel kadroya xwe ji vir herim". Li gorî daxuyaniya hîndekarên (egîtmên) navborî, Hakan Küçük mafdar e û mafdariya xwe jî îspat kiriye. Her wiha wan bal kişand ser helwesta Rêveberiya Zanîngeha Mersînê a li dijî YÖK'ê û wisa axivîn: "Rêveberiya Üniversîteyê li gor pîvan û metodên YÖK'ê dimeşe û

rêxistinên sivil jî dixapîne. Her çiqas dibêjin em demokrat in jî, lê ew faşist in!"

Dîsa Atış, Dündükçü û Karaoğlu dan zanîn ku, Rektoriya Zanîngehê, rêveberên sendikayan civandine û der barê wan de gotine 'Ev kes bêker û ne şareza ne' Li dijî vê yekê wan wekî mînak, pirtûka Mustafa Karaoğlu ya li şer Tansu Çiller dan û gotin ku, rê nedane ku ew pirtûk wekî tez li Üniversîteyê bê parastin, lê niha li ber çapa duyemîn e.

Di vê bûyerê de xaleke balkêş jî slogana hevalên Hakan Küçük a wekî 'Bêdeng ma, dor hate wî!' ye. Hevalên Küçük, sedemên vê yekê wiha rave dikin: "Hakan zêde ne politîk bû. Me jî bi awayekî îronîk û tinazwerî ev slogan avêt." Li ser rewşa tenduristî ya Hakan Küçük jî hevalên wî gotin ku, ew jar bûye û hin tiştan bibîr nabe.

Li aliyê din tê ragihandin ku, ji bo Rêveberiya Üniversîteyê Mersînê şer û pevçûnek heye. Di nava üniversîteyê de, kesên ku aligiriya YÖK'ê dikin, Hakan Küçük û hevalên wî li dijî rêveberiya üniversîteyê sor û germ kirine. Lê, balkêştirîn xal ew e ku, Rêveberiya Üniversîteyê Mersînê û hîndekarên grevkar wekî demokratîk û pêşverû tên nasîn. Li aliyê din Sendikaya Peywirdarên Hîndekaran (ÖES) û Komelaya Peywirdarên Lêkolîner ev bûyer şermazar kirine. Lê şaxa EĞİTİM-SEN'a Mersînê ji bo vê bûyerê biryara bêterefiyê standiye. Tê gotin ku, her du alî jî bêhemdî xwe hatine vê qonaxê û ev bûyereke dûvedirêj e.

A.WELAT/ MÊRSÎN

**TÎŞK**

**Nêçe dewo ra dewe**



KAZIM TEMÜRLenk

Koyê Sipî ra cêr, dew ê, dewadê vesayî ya. 38 ra raver, silxetîna aye zey îştaronê asmên bî. Xozano de bîne dewe, waxtê karan (ekin) de serê dewe biyêne hurînda waro. Kayê Kelebute Xêça vesayî yê, roze, hurînda xo de, şîn û şivanî. Cor de cêro eskerê tirkî amey, day arê, berdî hetê Koyê-Sipî ser. Nêweş, kôkim rawira yî bîn jî Çalê Sevzike de kişiyay. Gonî ze laserî-kenger da arê berd. 365 mordem, cînî camêrd, doman, pîl, dixaskanî ginay Dewreş ro, reyna jî nêheşiyay xo.

Înat ro yîno anco biye gurlax xêçe. Ti vana iyê ke merdê, reyna amey dîna. Wertê dewe de vengê domano, pilo qe kemî nêbî. Milçiko gile şîvgalo de halend virast. Amnan ke leyr hako ra vejiyene, qiste qista îno ra belû bî ke hurîn da xo ra zaf hes kerdêne. Bononê xêçe sero, Tayîne movend kerdêr, tayîne dame, domano daylan, pilo ci rê kay kerdêne. Dewleta tirk onca (ancî) amê, onca amê. Xêçe tersê 38 hona xo ser ra nê eşî bî, ê kamî ke, qedexa xo cayêde esto, vejiyay xêça vesayî ra. Nika iyê ke dewe ra qeyr, qedexa xo çîno, dewe der ê. Dewe ra cêr mezrade xêçe esta name xo Hiçîge wa. Sodiran bilbilî wananê dormê bona de. Tîjî zobîno vejîna ver va Hiçîge de koyan sero. Asma adare de çîçe ze vore. Nîsane de talbörîk, gulane de îndî hergu ca kewî yo. Corde. Hiçîge ze cazimî awsena. Gojî ze kowo biye girs, Murî, Sayî, Vamî, Herîcî, Tu Vişney, Şaqetîrî her gu ca gureto xo dest. Çirtan ra axwe hata ke resena cêr her gu pirtley xo caye ro sono. Kaleka çirtan de nergîz, sosînî rind çîna bîne dana tabîat. Amnan bine tuyode vengê çel çîçî qe kem nêbiyê. Hele pesewe ke cûn çarnitene, bine asme de dîna biyêne ê îsanî. Serê bono de kutene ra, hata ke asmên de îştarey ne mîne, nîşiyenê hewn ra. Arzeley pesewê peroz çî şîrîn bî. Payîz Hiçîge biyêne reng be reng. Her gu pelga îmise babet-babet reng yurmene. Zimistan Hiçîge çî ze dorme xo bena sipî. Erxoça Hiçîge sero awreş, simorey, ku zey-kune govendî. Pirtley pirtley ze çîçege hewne sewe vorena vore.

A Hiçîqa nika, ne zimistan zîniya, ne jî amnan zanena. Nika Hiçîge ra ne vengê domano (qeyran), ne jî vengê pilo yeno. Hiçîge de kes nika vora serê bono ne erzeno, Hiçîge de nika kes tûyo nêsaneno ra. Gul sosînî, nergîzî nika çîna biyê vile çewt. Vare jî, bize jî koziko de kay nêkene. Ne kes îstarey moreno, neçî îstarey îndî rind bereqîne.

Hiçîge nika reyan vesna. Hurînda bono de der bero vesayî, jû jî dêsê ke rîjiye estê. Ne milçîçî nika deso de halendo virazene, ne jî mase xo rê xorî de çê (alîn) virazênê. Ze çor hazar dewanê Kurdistanî, Hiçîge jî nika vile çewita: Hama Hiçîge jî ze dewanê bînan zanena ke hata ke mîletê ma, dar û berê ma, koyî destê ma, derey derxûney, ter û tûr, jar û darî, dewe gomey, hata ke bedelê azadîno xo mederê bine bandora dismenî ra nêvejîni. Na cêre Hiçîge Deregol rê çî niya ro. Deregol çî mezra de Xêçe wa, aye jî zulumê dewleta tirk ra neşîbi xo guret. Arê îndî nêgurîno, hopa arey de domanî axwe xo ro nêkene. Sulele, tu, murî nika biye werde heşî.

Nika waxte yînon o, hama no dewran boyna niya nêsono. Rozê çerxê dewranî heta ma ser çî çerexîno. No dem çî nêzdî yo.



# Şivan û Paşa (2)

**P**aşa bi wezîrê xwe ve li hev rûniştin. Li ser xwesteka şivan biryar girt. Welat tev teslîmî şivan kir. Di nava 24 saetan de her tişt di bin fermadariya şivan de ye.

Şivan, ferman da, tabûrek leşker, derxist qadê. Berê tabûrê da cengê. Şivan li nivê rê muhlekî da û sekinî, dest bi axaftina xwe kir û got:

– Kî ji we ditirse bila vegere mal. Kî bê dilê xwe hatiye, bila ew ji vegere mal. Biryara wî ye.

Piştî şivan dengkirina (axaftina) xwe qedand, pir leşkeran xwest vegerin mal. Lê ji tîrsa newêrin xwesteka xwe bibêjin. Hin leşkeran destê xwe rakirin û gotin şivan: “Em dixwazin herin mal.” Ew leşker vegeriyan. Dema ew bûyer hate çêkirin, leşkeran dît ku şivan wan nakuje û ji dil girêdayî gotina xwe ye. Pir leşkeran ji xwe re got: “Çima me ji destê xwe ranekir, wê em ji bi rê kirina mal.”

Şivan dest bi meşa xwe kir, berê xwe da rîya şer. Berî ku bigihêje eniya cengê, şivan tev dan sekinandin û ji leşkeran re got:

– Ji min netirsîn. Kî ji we dixwaze here mal, bila destê xwe rake, ew serbest e. Kî ji we ji şer ditirse bila vegere, destê xwe daye. Gava şivan ev gotin kirin di cih de nivê tabûra leşkeran destê xwe rakirin û gotin:

– Em dixwazin herin mal. Zarokên me wê sêwî bimînin. Em bê dilê xwe hatine. Şivan ew kesên ku destê xwe rakirine tev vegelandin.

Êdî hinekî dil xuşxuşî di nav leşkerên ku mane de li hemberî şivan hate çêkirin. Leşkeran ji xwe re digot:

– Gelo ev şer nake? Nîviyê tabûrê vegerand mal. Leşkerek bi cesaret rabû ser xwe û got şivan:

– Te nîviyê leşker ve gerandin. Ka ji me re bêje tu çi dixwazî? Armanca te çi ye? Tuyê şer bikî an na? Şivan dest bi axaftinê kir û got:

– Ez bi tenê bimînim jî, ezê şer bikim. Şerêkî bi xwestek û bi dilê xwe. Ev kesên ku ne bi xwesteka xwe hatine şer, wê çi fedê li min bikin. Bila li malbat û zarokên xwe xwedî bikin, nehatina wan ji hatina wan baştir e. Dengkirina şivan bandoreke mezin li ser leşkeran çêkir. Wan leşkeran bi hev re got:

“Em heyânî mirinê bi te re ne û emê şer bikin.” Tevan bi dilekî xweş meşa xwe berdewam kir.

Şivan gihîste qada şer. Ji her leşkerekî re kozîk çêkir û leşker bi cih kirin. Dinya êdî tarî dibû. Carekê li hemberî leşkeran agir sê caran veket û vernîr. Şivan fêhm kir ku li paş vê îşaretê tiştek

heye. Şivan bi tenê çû ba wan û silav li hev kirin. Mirovekî ji wan gote şivan:

– Tu fermadarê tabûrê yî. Me tenekeyek zêr ji te re aniye, tu leşkerên paşa bifiroşe me? Wekî ku neh qumandarên we yên berê her yekî tenekeyek zêr girt û çûn. Şivan meselê hinekî fêhm kir û ji wan re got:

– Tabûra min gelekî mezin e. Divê hûn du teneke zêr bidin min. Ger ne wîha be ez qebûl nakim? Ew di teneke zêr

Li ber destê sibe ew hêza welatê din bi ser kozîkên leşkerê şivan de hatin. Lê wan ji xwe re digot: “Leşker tev razane.” Ew qas tedbîr negirtibûn. Dema ew gihîştin ber kozîkên leşkeran, şivan ferman da û bi yek gotinê re êrîş dan ser dijminê xwe. Koka wan li wir qelandin. Çavê welatê din şikestin li hemberî takîk û êrîşa şivan.

Şivan li leşkerê xwe ve bi moralekî bilind û serfirazî vegeriya welatê xwe.



tînin ji şivan re dibêjin:

– Tu leşkerên xwe bike xewê, emê ber destê sibê tevan bikujin. Tu jî zêrê xwe bibe ji malbata xwe re xerc bike. Şivan dibêje:

– Bila wekî we be, hûn dizanin.

Şivan vegeriya cem leşkerên xwe ji wan re got:

– Ger îşev kî ji we di kozîka xwe de razê, ezê wî bikujim. Xwe amade bikin, dijmin li ber destê sibê bi ser me de tê. Hûn bê rehîm li dijmin bidin, bila dilê we pê neşewite. Êdî her leşkerek di kozîka xwe da hişyar ma. Leşkerên dijmin bi rihefî û bi kêfxweşî bi ser wan de dihatin û ji xwe re digotin:

– Bi vê êrîşê re jî emê hemû leşkeran bikujin û welatê paşê jî ji xwe re teslîm bigirin.

Gel, paşa û wezîran bi def û zurne ber bi şivan û leşkeran de hatin. Lê hîna hikûmdariya şivan neqediyaye. Şivan dest bi axaftinê kir, hemû gel dev ji dîlan û daholê berdan, şivan guhdar kirin. Şivan ferman da, hemû gel dev ji dîlan û daholê berdan, li şivan guhdar kirin. Şivan ferman da û gote leşkeran:

– Hûn deh darê idamê li vê qadê amade bikin û gazî neh qumandarê ku di şer de xilas bûne û paşa kin. Tev li qadê sekinandine. Ji wan neh qumandan re got:

– Hûn tev xayîn in, kanî we tenekeyê zêran çi kirine? Wan qumandan kirin mizemiz û devê xwe li hev gerandin. Şivan dîsa gote wan:

– Dev ji derewan berdin. We her yekî we tenekeyek zêr ji dijmin stand. Min

du teneke zêr ji dijmin standin.

Wan qumandarên di şer de xayînî kirine tevan tenekeyên zêran anîn qadê li pêşiya gel danîn. Şivan li pêşiya gel banî paşê kir û jê re got:

– Were ez mersela eyarê kûçikê ji te re bibêjim. Ez diçûm ber pezê xwe, rojekê li mal karê min derket. Ez li mal mam, min du kûçikên xwe şandin ber pez. Ji ber ku min nikaribû biçûma ber. Gava min karê xwe dikir evar bû, pezê min ji çolê hat. Min pezê xwe hijmart. Lê mihek jê kêmbû, ew miha ji çolê hat. Min pezê xwe hemû hijmartin. Lê mihek jê kêmbû, ew miha jî ya herî qenc bû. Bû roja din dîsa ez li mal li ser kar mam û kûçikê min jî çûne ber pez. Piştî ku êvar dibe, pez vedigere mal. Min dîsa pezê xwe yeko yeko hijmart, mihek din jî tune ye. Roja sisêyan ez bi xwe çûm ber pez. Min xwe li çolê li xew danî. Da ku ez bizanibim mihe min kî di-

be. Bi carekê da gurînî bi keriyê pez ket, lê min qet xwe nelivand. Kûçikek hate hafa min ez bêhn kirim, dît ku ez razame û çû.

Ez bi dizî li pey kûçikê xwe çûm. Min wisa kir ku min nebîne. Wan du kûçikan mihek girt û birin ji guran re. Bi hev re ew mih xwarin. Dîsa ez bi dizî vegeriyan û min xwe li xew danî. Kûçik vegeriyan ba min, dît ku ez di xew de me. Xebera wan jî ji min tune, ez pê hesiyame. Êvarê em vegeriyan mal. Min her du kûçik bi sing ve girêdan. Serê kûçikê spî min di ber re jê kir. Û kûçikê belek jî bi zindî eyarê wî gurand. Min tijî ka kir û bi pêşa deriyê xwe ve daliqand. Da ku ew ji min re bibê nîşanekê ku ez fersendê nedim xayînê nava xwe.

Şivan dengkirina xwe qedand û ji paşê re dîsa got:

– Hey bêwijdan tu qet napirsî ew leşker çawa dimirin û tînen kuştin. Û bes qumandar tînen xilaskirin. Qet dilê te bi wan xortan nedîşewitî. Tu dizanî bav û dayikên wan bi çi zorê ew mezin kirine. Çawa xew û sebra te dihat? Du mihe min hatin windakirin, min bi miha sisîyan re min xayînên xwe girtin. Lê paşa çavên xwe berdabûn erdê. Piştî ku şivan dengkirina xwe qedand, ferman da ew neh qumandarên xayîn tevî paşê wan bi dar ve bikin. Gel tev ji biryara şivan re çepik li hev xistin û kêfxweş bûn.

Êdî ew deh mirovan hatin bidarvekirin. Şivan jî bû paşayê welatê xwe. Ji nû ve dem û dewraneke tekûz ji welat re hate gerandin.

(Qediya)



# “Jina Azad niştimana azad e”

Jin, ji ber statûya xwe ya komelayetî, êş û janên kapîtalîzm û feodalîzmê tundtir û xedartir dikişîne. Ji ber vê yekê jin bêhtir hesitiyar û pêjinkar e. Gava mirov bala xwe bide çalakîyên xwefedayî yê gerilayan ev yek bêhtir xwe dide der. Ji ber ku kesên ku çalakîyên xwefedayî pêk anîne hemû jin in. Ji ber vê yekê ye rêberê şoreşa Çînê Mao li ser şervaniya jinan wiha gotiye: “Bêyî piştgiriya jinan tu şoreş bi ser nakevin.” Ev yek ji aliyê Serokatiya Tevgera Azadiyê ve wiha hatiye zimên: “Rizgariya jinan, rizgariya Kurdistanê ye.”

Jinên Kurdistanî jî li ser vê bingehê bi navê “Yaşamda Özgür Kadın (Di Jiyane de Jina Azad)” kovarek derxistin. Berpîrsên kovarekê wekî şîr ji xwe re ev slogan hilbijartine ‘Jina Azad Niştimana Azad e.’ Her wiha sedemên weşaneke bi vî rengî jî wiha hatine rêzkirin: “Jina kurd ji bo azadbûna xwe pêngavên heja û tekûz avêtin. Lê li aliyê din weşaneke jinên kurd a serbixwe tune ye. Ji ber vê yekê ji bo ku jin bi zanebûn piştgiriya şoreşê bikin û xwe ji qelsî û lawaziyên xwe bişon, ev weşan gavek e.”

Di vê hejmarê de Leyla Zana bi navê “Dest-pêk” nivîsek nivîsiye. Zana di vê nivîsê de, li ser rewşa jinên kurd a raborî û pêvajoya pêşketina jinên kurd radiweste. Dîsa di gotara bi navê ‘Dem karkirine dide ber me’ de sala 1997’an bi awayekî giştî hatiye nixandî. Di gotarê de, der barê planên welatên emperyalîst ên ji bo Rojhilata Navîn û stratejiya Tevgera Azadiyê hêlengandinek hatiye kirin.

Di vê hejmara kovarekê de, nivîsara herî seyr û balkêş a bi navê “Ji jinan leşker nabe!” ye. Di gotarê de



pêvajoya dîrokî a pêşketina jinan û serdestiya mêran tê şrovekirin. Bi taybetî jî dîtînen wekî ‘Jin nikarin leşkeriyê bikin’ tê rexnekirin. Lê di nivîsê de hin nixandînen dîrî jargona (söylem) marksîst hene. Bo nîmûne, şerxwazî û çavnebarî wekî taybetmendiyê

mêran tê binavkirin. Wisa hatiye nivîsandin: “Li cihê ku jin lê heye, aştî, dilovanî heye. Cihê ku jin lê tune mercên jiyane tune ne.” Divê bê gotin ku ev girêdayî desthilatdariyê ye, ku jin bibin desthilatdar wê heman tişt pêk were. Ev ne taybetiyeke siruştî ya mêran e.

Sema Yüce bi navê “Çand û Huner” gotareke heja nivîsiye. Yüce di nivîsê de li ser taybetmendî û naveroka şoreşa çandî û hunerî dîtînen û boçûnên xwe derbirine. Nivîskarê li ser van pîrsan nivîsa xwe darêjîtiye: “Şoreşa çandî çi ye?”, “Divê em çawa li çanda kevnare binêrin?”, “Çanda nû çi ye?”, “Em dikarin xwe çawa bi saz bikin?” û “Şoreşa hunerî divê çawa be?”. Di nivîsê de digel ku naveroka şoreşa çandî û hunerî hatiye ravekirin jî, li ser rola zimên nehatiye rawestîn. Ev rol ji bo civaka Kurdistanê bêhtir girîng û pêwîst e.

Li aliyê din, di kovarekê de nebûna nivîsên kurdî kêmasiyeke mezin e. Ji ber ku jinên kurd ka zimanê kurdî ne û kurdî baştir dizanin. Nivîsên bi kurdî jî hemû weşanên bêhtir: ji bo weşanên li ser jinan pêwîst in.

Di nivîsa bi navê ‘Divê Tevgera Jinan berê xwe bide kedkar û hejaran’ de jî, li ser nêzîktêdayina medya, kemalîzm, kapîtalîzm, Partiya Refahê û sendikayan nixandîneke heja heye.

Ji bilî van, gotar û nivîsan, ev nivîs di vê hejmarê de cih digirin: Hevpeyvîn digel Eren Keskin, Jinenîgariya Azimê Demirtaş, Daxuyaniya konferansa jinan a HADEP ê, Li welatê me bi sazûna şoreşgeriya jinan, Tesîrên şer li ser jin û zarokan û Dayikên şoreşê.

MAZLUM DOĞAN

## Restorasyon û Nîjadperestî

MEDENÎ FERHO



Nîjadperestî bi Tewratê dest pê dibe. Li gorî Tewratê nişê pîroz, zarokên yezdanî pak cihû ne. Mirov, ji dayika xwe cihû dibin, pişt re kes nabe cihû. Misilmantî oleke êlî ye, lê bû ola cihanê. Careke din: “Malê kâfiran li misilmanan helal e.”

Ewrûpayê, Asya bi Awestayê nas kir. Piştî ku Anquetil Duperonê frensî Awestayê wergerand, Ewrûpa felsefa rojhilat nas kir. Dîrokzanên restorasyonê bi nîjadperestî bîrdoza xwe avêtin holê û bi plansaziyeke xurt û berz xwe li hevûdin dane hev. Lê, komên mirovan, yê li derveyî xwe, bi piranî Asya wekî pezê bêşivan dît.

Ber bi dawîya sedsala bîstan ve rewş hate guhartin. Wîetnamiyan restorasyona amerîkaniyan ne pejirand û dîroka nûjen nivîsîn. Amerîkaniyan, li hemberî berdelên pir gîran tenê tiştêk bi dest xist; Rambo!..

Yan jî, gernasên xwînrij ku di filmên pîrbîhayê dolaran de dilîzin. Heya îro kifş nebûye, bê ziyana Amerîka bi van filmên rambowarî hatiye veşandin, an na!..

Çend sal in ku li Tirkîyeyê jî, gotina restorasyonê bûye benîştê devê hinek kesan. Bîrêz Yalçın Küçük jî, yek ji wan kesan e. Di pirtûka xwe ya dawî de (Sicil) li ser vê mijarê rawestiyaye û li gorî baweriya xwe, ku hêviya wî ji serdar û fermandarên desthilatdar (!) heye, wiha bangawaza xwe, dibe: “Îro welatê me, di nava demjiyana duyem ya restorasyonê de ye.” (rûpel 12) Di pêşgotina pirtûkê de jî wiha dibêje: “Sih salên dawî di encama şerê hundirîn de neyê dîtî, di rewşa îroyîn de dîtina restorasyonê mimkûn nîn e. (...)

Dûmahîya paşerojan jî bi nîşaneyên reş ên pîrsê formûle dibin. Gelo restorasyon? Yan jî şoreş?”

Gotina restorasyonê pir cîlwekar e. Mîna gotina oryantîzmê.

Tiştêk heye ku nayê jibîrkirin: “Çepgirên herî tundraw (radikal) ên tirkî jî ‘23’an û vir de her dem doza kurdan kirîne palik û pê li çarenûsiya gelê kurd kirine. Mîna xareke zazîk pê lîstine. Bîrêz Yalçın Küçük jî aqilmendiya restorasyonê dibe. Gelo dilê wê qêbil nade ku şoreş be? Ya duyem:

“Dîrok, berî her tiştî çavdêrî ye, tégihîştin û zanîn e, da ku bi nivîs û xêzkirina jîndariya berhembêz dibe. Ya sêyem: Wîlo xuya dibe ku gelê kurd, çarenûsiya Sedsala Bîstûyekê xêz dibe. Çend sal in ku cîhana kurdan ne di gerxîşka Copernîcus de ye. Li gorî daxwaz û dilxwaziya dijminan derî gera normal di pêvajoyake têr kul û elem û nexweşî de dizivire. Gelê kurd ne di nava civaka cihanê de bû. Civaka cihanê li gorî berjewendiyên xwe, cihê xwe di gerxîşka sîstema rojê de çêkiribû. Dêdora 40 milyon kurdî li derveyî vê sîstema gerdûnî, di encameke têkçûnê de dijîn. Heger di gava duyem de gelê kurd dikaribe bibe çînê aborînas û dikaribe lîstika xwe bilîze, pîrs-girêk çareser dibe. Her wiha ne restorasyon, şoreş dibe...”

Hingî, tu pêdiviya aqilmendên ku nêçîrvaniyê dikin, da ku rûyê xwe bi ewran bitemirînin namîne. Ji ber ku Rustemê Zalê dema diçû nêçîra dêwan, rûdinişt û xwe bi ewran dinixumand. Di navbera Rustemê Zalê û dema me de 5 pêxember rabûne. Zerdest, Musa, Dawud, Îsa û Mihemed... Çend hezar sal dikin gelo? Hê jî, em bi nixumandina foteyên ewrî bêne xapandin! Ne şerm e gelo?

Ne hew qasî jî!..



# Nimêja bêdestmêj

**R**êwiyek di riya xwe de dimeşiya. Wexta nimêjê fikirî ku li ku derê nimêja xwe bike. Li dora xwe nihêrî, dareke mezin, ji şinahî têrxemilandi nêzîkî riya xwe dît. Ji xwe re got, "Ezê li bin siya vê darê nimêja xwe bikim" Mirovek jî di bin siya darê de rûniştiye, dibîne ku kesek ber bi vî ve tê. Ji bo ku xwe jê veşêre hildikişe diçe ser darê.

Rêwiyê me digihêje binê darê, di honikahiya siyê de qamet tîne, berê wî li qiblê dest bi nimêjê dike. Ku nimêja xwe diqedîne dest bi duayan dike. Di paşiya duayê de dibêje:

- Ya rebî!.. Tu qebûl bikî ya rebî!..

Ji nişke ve dengêkî wiha tê wî:

- Ez qebûl nakim.

Rêwî şaş dimîne. Difikire, dibe ku şaşitîyek kiribe, ji bo vê yekê nimêja xwe dubare dike. Dîsa dua dike û dibêje:

- Ya rebî tu qebûl bikî.

Deng dîsa tê, dibêje:

- Ez qebûl nakim.

Dîsa bi xwe difikire dibêje: 'Min vê carê jî şaşitîyek nekir, lê qewlê nebî sê car in, ezê dîsa nimêja xwe bikim. Nimêj dike diqedîne û dîsa duayê xwe dike û qebûlkirina duayê xwe ji Xwedê teala



dixwaze:

- Ya rebî tu qebûl bikî.

Dîsa deng tê dibêje:

- Ez qebûl nakim.

Rêwiyê me hêrs dibe û dibêje;

Xwedêyo! tu qebûl dikî bike, nakî jî qet neke, tu dizanî, min jî jixwe destmêj negirtibû.

REFÎQ GÊLIÇ

## Qor çû serî

**M**irovek li ber sekeratê ye. Lêzîmên wî, nas û dost û mele li ber serê wî ne.

Mele dibêje:

- Eşheda xwe bine!

Nexweş qet bersivê nade.

Çiqas jê re dibêjin:

- Heyra, tu yê bimirî, eşheda xwe bine.

Lê, dikin nakin camêr eşheda xwe nayîne. Wê demê hevalekî wî yê ku her tim bi hev re xebitîne dibêje:

- Hoste, qor çû serî!

Bi vê gotinê re mêrik di cih de eşheda xwe tîne. Tev heyri dimînin û ji hevalê kesê nexweş dipirsin:

- Malnemîrat ew çi bû?

Em dikin nakin zilam eşheda xwe neanî, lê te got: 'qor çû serî' bi lez eşheda xwe anî.

Hevalê wî nexweşî dibêje:

- Dema em bi hev re dixebitîn, her ku wî qora di diwêr lêkirinê dibir serî, piştî xwe rast dikir û eşheda xwe dianî.

ROŞAN LEZGÎN

## BI XELAT...

## XAÇEPIRSA BI XELAT (103)

## XAÇEPIRSA

PEZ	KOV	Î	MEH
ZÎ	RAR	LEVA	
Î	MLA	ÎN	RAV
Î	DAŞ	C	YÎ
DEM	RIÇI	FÎN	
RÎŞ	M	N	
A	S	A	C
O	T	O	N
A	Z	Î	N
E	A	L	

PEYVA VEŞARÎ → SERSAL

### Bersiva Xaçepirsa 101'ê

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 103'yan **Kaseta Grûp Munzur "Tutuşturun Geceleri"** ye.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnişana xwe ji me re bişînin.




Pênc kesên ku xelata hejmarê 101'ê Salnameya NÇM'ê ya 98'an qezenç kirine: Ercan Gezgîn/Dilok, Mehmet Nur Çakas/Mêrdîn, Safiye Akdağ/Stenbol, Bêrivan Altınışık/Êlih, Aysel Adsay/Mêrdîn

Dijberê 'hişk'	Bi kirdkî heval	Bîhn	Xûxllok	Dijberî 'zo'	Neqş, xeml
Şehîdek (wêne)	Cumle	Tipekî dengêr	Karê matbayî	Xwişka bavê	
					2
Xuda, Yezdan		Serîhîlda			
Dawera azotê		Kurkirtin			
	Bi kirdkî 'got'		Dergûş		Tipek
	Şexsî		Lêdan		Tav
Mewzî					
Navê yekineyekî leşkerî			Dawera potasyomê	Pêşgîrek	7
			Qîrêj	Tipek	
		Tevgerêke kişêkê		Xwartneke adanî	
		Tipeke Kurdî		Bajarekî lazan	
Dawera kukurtê	...xwestin				
Zinar	Pê masî tê girtin				
		Şêlo			6
		Cinavekek			
Nîşe			Heyberêk		
Pereyên İtalî			Tipek		
				Notayek	

PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7





# Grev qediya, kayê lîminê ramenê

Awa jî rind zana ke, jêw mardim çewres-pancas rojî veşan bimano, grev biqediyoyê jî, ê mardimî de newêşîna fîzîkî û psîkolojîk manena. Çoka wina kena ke, tepşiyayey pêro nêweş bimanê, meşê rind û weş bifikirê û îradeyê xo teslîm bikirê.

**G**revê veşanîno ke, zîndanên Erzeromî de ramitê, ebi mabend kewtinê serokê Giştî yê HADEP Murat Bozlak, cagenoyê serokê Giştî yê İHD'ey Osman Baydemir, serdarê komalanê demokratîkî bînan ser, rojê 55' in de (14'ê meng de) dewleta tirk wistenê tepşiyayan qabûl kerdî û grevê veşanîna qediya.

Ze ke yenê zanayin, nê seranê peyinan de, vaten ke ca de bo, Zîndanê Erzeromî biyê sembolê weşîta dewlet a tirk. Çimke dewleta tirk tepşiyayan rê zilm kena, îşkence kena, haqanê tepşiyayan xesp kena û zîndan tepşiyayan rê kena cehnim. Çoka tepşiyayê zîndanê Erzeromî ser de, di fînî hîrê mecbûr manenê qandê haqanê xo yê insanî grevê veşanîna, kenê. Dewleta tirk jî hetanî grev pancas-şestî roj nêbi, tepşiyay nêweşî nêbi û merdîna nezdî niyame goş nêdane wistenê tepşiyayan.

Dewleta tirk fina zey verî senî ke, tepşiyay bî nêweşê giranî, merdîna ame nezdî, hewna goş da wistenê tepşiyayan. Hetanî 13'ê meng, kamîna sermayanê dewlet fekê xo akêrd, vat: "Êkê grevê veşanîna kenê terorîst ê, ma terorîstana nênişem ro. Xora, wistenê tepşiyayan jî insanî niyê siyasî yê. Ek wistenê înan, insanî biyayê, ma goş dayê ci."

Bewnê sermayanê dewleta tirkê ke ver dê, di rojan nê qisey vatî, nika jî niştî ro, wistenê tepşiyayan rojê 55' in de qebûl kerdî û înan grevê veşanîna qedîna.

Dewleta tirk çira wina kena? Yanê haqan xesp kena, zîndan tepşiyayan rê kena cehnim, tepşiyay ke, benê nêweşê giranî, merdîna yenê nezdî awa wistenê



tepsiyay qabûl kena û grevê veşanîno qediyeno. Rastî gerek kes nê polîkanê dewlet sero vîndiro û nê polîkanê lîminan rind bivîno.

Dewleta tirk senî kena, nêşena tepşiyayan şarî ra tecrît kiro û nêşena fikirê înan bigro xo dest. Dewleta jêw bedenê înan şena bigiro, çahar dêsan miyan zew bî nêşena teva bikro, kiştî bîn ra jî, awa her roj gerîlayan ra darbey gena û şina kotî, keso ci qabûl nêkeno û awa qewniyena.

Nînan ser jî dewleta wazena heyfê qewnayin û vînikerdîna şerî, tepşiyayan ra bigiro. Zewbî jî awa xo jî rind zana ke, wexto ke, haqanê tepşiyayan, ci dest ra bigiro ê mecbûr manenê grevê veşanîna

kenê. Xora grevê veşanîna ke, kerd hetanî grev çewres-pancas rojî nêbi, goş nêdane ci. Awa jî rind zana ke, jêw mardim çawras-pancas rojî veşan bimano, grev biqediyoyê jî ê mardimî de newêşîna fîzîkî û psîkolojîk manena. Çoka wina kena ke, tepşiyayey pêro nêweş bimanê, meşê rind û weş bifikirê û îradeyê xo teslîm bikirê. Polîtîkayê dewlet wina yê, la belê kes nêşena vajo dewleta çira wina kena.

Çimke zey vatena maya jêw tepşiyayey: "Na dewlet barbar a, faşîst a û dewleta faşîst û barbar ra jî, tevayê rindî nêpawyenê. Raya nînan ra xelsiyayin (reyayin), xeftiyayin o û şer o. Bê na ray zew bî ray jî çiniya."

MEMED DREWŞ

## WELAT

ISSN 1301/7497

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayınçılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNÎŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX:  
(0 212) 251 90 13

Gerîndeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran  
(Yaza İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê têkiliyên bi gel re  
(Halkla ilişkiler müdürü)  
REFİK İNCİR

Berpîrsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.  
BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:  
(Nünerê Giştî yê  
Ewrûpayê)

Mahmut Gergerli  
49 871 67 08 15

Brüksel:  
Medenî Ferho  
32 532 721 12 03

Suriye:  
Jana Seyda  
Helîm Yûsiv

Berlin:  
Silêman Sîdo  
00 49 30 691 6495

Hannover:  
Selîm Biçûk  
49 572 18 13 60

Stockholm:  
Robin Rewşen  
46 87 51 05 64

Bonn:  
Ahmet Baraçılıç  
49 228 66 62 49

Hollanda:  
S. A. Fewzî  
31 104 85 55 43



Ji

## Gündem

ê



11 rêbendan 1998 Yekşem:

## DIXWAZIN JENOSÎDÊ BIBIN SERÎ

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan daxuyand ku di bingeha koçkirina penaberên kurdên siyasî û tifaqa komara tirk û Îsrailê de daxwaza bi lezgîni pêkanîna jenosîda kurdan heye. Öcalan got ku du aliyên yalakin û koçkirina ku bi destê dewleta tirk û mafyaya wî pêk tê, hene û ev alî wiha şrove kirin: "Dixwazin başûrê Kurdistanê jî bikin tirk û ji bo vekirina deriyên Yekitiya Ewropayê dixwazin Kurdistanê û rewşa kurdan wekî şantaj bi kar bînin." Her wiha Öcalan got ku tu teklîyên wan bi koçkirina penaberan re tune ye û ew derketina derveyî welat ji mayîna li zindanê xerabtir dibînin. Serokê Giştî yê PKK'ê der barê grevên birçibûnê de ji wiha got: "Girîng e ku mirov xwe bi destê faşîzmê ve bernede, pêwîst e berxwedan pêk were û ew jî hatiye kirin."

12 rêbendan 1998 Duşem

## MALBATÊN GIRTIIYAN PARTIYA ANAP'Ê DAGIR KIR

Piştî ku li girtîgehan rewşa girtiyên ku ketine grevê birçibûnê hate radeya mirinê, li gelek bajarên Kurdistanê û Tirkiyeyê malbatên girtiyên ketin grevên birçibûnê. Roja

11'ê rêbendanê li Amedê nêzîkî 300 xizmên girtiyên ji bo protestokirina dewletê û piştgiriya girtiyên partiya ANAP'ê dagir kir. Malbatan daxuyand ku zarokên wan roj bi roj nêzîkî mirinê dibin. Ji ber ku jan û êşê dikişînin li vir in. Û ew tu car rê nadin ku zarokên wan jiyana xwe winda bikin. Dayika girtiyê bi navê Nevzat Çelik, Hava Çelik daxuyand ku kurê wê ev 7 sal in ku di girtîgehê de ye û eger rê li ber rewşa xerab neyê girtin ewê jî dest bi rojiya mirinê bikin.

13 rêbendan 1998 Sêşem:

## GELÊ KURD TÊ KUŞTIN

Wezîrê Karê Derve yê Îtalyayê Alberto Dini, daxuyand ku dewleta tirk li ser gelê kurd tevkujiyan dimeşîne. Dini, dibêje ku qeyrana (krîz) gelê kurd ancak bi destkariyê navneteweyî bê çareserkin. Her wiha Wezîrê Karê Derve yê Îtalyayê Dini got ku divê dewletên ku axa kurdan dagir kirine, ji bo çareseriyê li hev rûnin. Alberto Dini radigihîne ku dewleta tirk ji bilî li herêmên di destê Tirkiyê de ne, li başûrê Kurdistanê jî qetlîaman pêk tîne û ji bo vê yekê ji ji bo ku mesele bibe Yekitiya Ewropayê, çî ji destê dewleta Îtalyayê were, ewê bike.

14 rêbendan 1998 Çarşem:

## ALMANYA:

## "PKK NE TERORÎST E"

Serdozgerê Almaniyayê Kai Nehm, roja 13'ê rêbendanê di daxuyaniya çapemeniya ku xebatên salekê tê de tên nixandî de, da zanîn ku PKK ne rêxistineke terorîst e. Nehm diyar kir ku ew heta vê gavê negihaştine biryarekê ku PKK mirovan dike û agir bera cihan dide. Piştî daxuyaniya serdozger Nehm, tê texmînkirin ku wê di pêşerojê de qedexebûna ku dewleta alman danîbû ser Partiya Karkerên Kurdistanê jî holê rabe.

15 rêbendan 1998 Pêncşem:

## BIRÇIBÛN QEDIYA, ÊDÎ DORA TEDAWIYÊ YE

Di roja xwe ya 55'an de greva birçibûnê ya girtiyên li girtîgehên Erzeromê (Tîpa E û Tîpa Taybet) bi pejirandina mafên girtiyên dawî lê hat. Doktoran daxuyand ku ji bo tendirustiya girtiyên xeterî jî holê ranebûye û divê di demeke zûtîrîn de tedawiya girtiyên bê kirin. Yekitiya Tabîbên Tirkiyeyê (TTB), ji bo ku mûdaxaleyê li girtiyên bike, li benda destûra wezaretê ye. Der barê kutabûna grevan de Berdevkê Platforma Demokrasiyê û Cîgirê Serokê Giştî yê İHD'yê Av. Osman Baydemir daxuyaniyek da û wisa got: "48 daxwazên girtiyên hatin pejirandin, ji bo ku ev daxwaz bi cih bînin em dê tim rewşê raçav bikin."

## Ji Edîtorê Gündemê

## PIŞTÎ 55 ROJAN DÎWARÊ BÊDENGİYÊ HATE QEWAZTIN

Di roja 55'an de greva birçibûnê ya Erziromê ku ev demeke dirêj e em di manşetên xwe de cih didinê, qediya. Divê bê pirsîn gelo çima 55 roj? Bersiva vê pirsê di serî de, di helwesta hikûmetê, ya medyaya birjuwa, kesên ku hembêza xwe ji wan re vedikin û di helwesta raya giştî ya demokratîk de xwe bi awayekî zelal dide der.

Serokwezîr Mesut Yılmaz di gera xwe ya Amerîkayê de di dema hevdîtina digel TV'ya CNN'ê de der barê rewşa girtîgehan û grevên birçibûnê û girtiyên PKK'yî de qala hewldanên hikûmeta tirk ên ji bo çareserkirina pirsgrêkên girtîgehan kiribû. Yılmaz der barê çareseriyê kêşeya kurd de ji "rêxistina terorê ku şidetê bi kar bîne, li hemberî xwe wê şidetê bibîne" gotibû. Li ber çavê dinyayê politikayên hikûmeta tirk ên der barê mafên mirovan û kêşeya kurdî de roj bi roj têk diçin û ji cidîyetê dûr dikevin. Li hêla din soza Mesut Yılmaz ku ji Yekitiya Ewropayê re dabû, ji vê gavê ve xwe di nav dosyayên li ser refên bi toz û telaz de dît.

Piştî Şevket Kazan wezîrê edaleta tuncê ye Oltan Sungurlu jî li hemberî birçibûnan piştî 55 rojan jî bêdengiya xwe xerakir. Medyaya birjuwa bi manşetên "fermo bîn nimêja cenazeyê" bang li jinan kir, lewre ji MGK'ê ji ser 100 î 10 puan girt. Ji bilî bi deh hezaran malbatên girtiyên ku ji bo girtiyên bibin piştgir, dest bi çalakiyan kiribûn, dayikên ku li Amedê Partiya ANAP'ê dagir kiribûn û gotibûn: "Ji bo ku em janê dikişînin li vir in", kesên li Stenbolê û xwendekar ji polîsan cop xwarin. Lê di sa ji toreya "Me li ber xwe da û em serketin" di sa dom kir.

\*\*\*

Bêguman para tiraliya raya giştî ya demokratîk, sendikayên ku bûne berdevkên rejîmê û rewşenbîran jî di berdevwama ve birçibûna 55 rojî de heye. Lê hunermendên ku di nav civakê de gelek xesas in? Di dema navborî de me çiqas dixwest ku em qirîn û berxwedana bilind bi notayan di manşetên xwe de binexşînin. Em hêvî dikin ku ji îro şûn de em dê ronakbîrên kedkar ên ramanan li aliyê çepê yê dayikan; hunermendên bi hestiyar jî li aliyê rastê yê dayikan di çarçoveyên wêneyan de bibînin.

\*\*\*

Li hêla din kuştina xwendekarê Zanîngeha İnönüyê Ümit Cihan Tarho jî beşek ji politikayên navborî yê dewletê ye, emê di sa jî ji her alî ve sûcên rejîmê binivîsînin û rastiyê biqirîn.